



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdi  
Mihdad Mihdad Bedirxan

# Armanç


Hejmar, No: 135  
Çileya Paşin  
January 1993  
Buha - Price  
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

Dewleta Tirk bi navê  
"tevgera hundurîn"  
Kurdistanê wêran dike

## Kurdistan ji nuh ve tê dagirkirin

Di vê meha dawîn de gundê Bedlisê, Tatwanê, Bingolê û Pasûrê bi teyare û helikopteran hatin bombardûmankirin. Li Tatwanê û li Şemdinliyê bombe teqiyen. Hêzên dewletê girtin ser gelek gundan. Li alî din cînayetên "qesas nedîyar" roj bi rojê zêdetir dibin. Di vê meha dawî de bes li Batmanê 40 kes hatin kuştin.



Di "tevgera hundurîn de" yek ji armancê dewletê gund in.

Piştî êrişa dewleta Tirk a payizê ku li hember meqrêne PKK'ê dest pê kiribû û heta nav Kurdistanê Iraqlê çêbû, berpirsêne dewletê dabûn diyarkirin ku wê "tevgera hundurîn" dest pê bike û ev êriş û operasyonê wan wê zivistanê ji dom bike. Serokê Erkanî Herb, Dogan Gureş, Qumandarê Hêzên Jendirme Eşref Bidlîs, serokwezir Suleyman Demirel, Waliyê Kurdistanê Erkan Unal ev tehdît di gelek beyanên xwe de dubare kirişûn.

Van du-sê mehîn dawiyê Ordiya Tirk li Kurdistanê teror û

Dûmahîk: r.11

Li Kurdistanâ Iraqlê êrişen Seddam ranawestin  
**Seddam li dû provakasyonê nuh e**



Kurd li hember êrişen hêzên Seddam di haziriyê de ne

Piştî şerê Xelîcê bi du salan, meha buhuri, di salvegera şer de xetera şerê duduyan derket holê.

Seddam di rojîn dawî yên sala 1992'an de dest bi nenaskirina bîrîyân Yekîtiya Netewan kir. Di vê meha yekemin ya sala 1993'an de gav bi gav nenaskirina bîrîyan pêşve bir. Beyan li ser beyanê da, dest bi haziriyê

êrişa li ser Kurdistanê û Başûrê Iraqlê kir.

Leşkerên Iraqlê yên bi cilê sivil, sê rojan li ser hev hudûdê Kuveytê îhlal kirin, gelek sîleh û cebilxane bi zorê anin alî xwe.

Seddam bi vêya jî nesekinî. Wî, sertên Netewan Yekîtiya yên ku berê qebûlkiribûn yek bi yek îhlal kir. Berê


li ber kontrolantên Netewan Yekîtiya yên ku wezifa wan bêçekkirina Iraqlê ye girtin. Nehîst bi teyarêne xwe li ser esmanê Iraqlê bigerin. Fuzyeyen li hember balafiran, li Kurdistanê û Başûrê Iraqlê (di bin xeta 32 û li seriya xeta 36 bi cih kirin).

Dûmahîk: r.11

**Berpirsîre Giştî yê Medya Gunesi  
Osman Aytar hat girtin**

✓ Li dijî êrişen dewletê 26 rojname û kovarê sosyalist, şoresser û pêşverû yên Tirk û Kurd çendekî berê beyanek derxistin. Di beyanê de tê gotin ku, "rojname ji aliye dewletê ve tênsansurkirin, buroyen rojnaman û kovaran di bin êrişen dewletê de ne, rojnamevan tênsansurkirin."

Mahkema Ewlekarî ya Dewletê (DGM) a Stenbolê di 22'ê Çileya Paşin de berpirsiyare Giştî yên rojname Medya Gunesi (Roja Medya) Osman Aytar tewqif kir. DGM'a Stenbolê sebebê girtina Osman Aytar, nivisa wî ya hejmara 22 ya (15-31 Çileya Paşin) bi navê "Di 93'an de ji bo hemleyen nuh" nişan dide. Li gor DGM'a Stenbolê di vê nivîse de, berpirsiyare Medya Gunesi popaganda cuðabûna dewleta Tirk kiriye û ev súc dikeve xala 3713



Berpirsiyare Giştî yê Medya Gunesi Osman Aytar (Foto: Armanç)

ya Qanûna li dijî Terorê ya benda 8'an. Wek tê zanîn ev qanûn di Nisana 1991'ê de hatibû derxistin.

Abûqata Osman Aytar, Eren Keskin li ser girtinê got, "ev cara pêşin e bûyerek wiha diqewime ku rojnamevanekî bi "Qanûna li dijî Terorê" tê tewqîfkirin."

Xwedîyê kovara Medya Gunesi Cemal Ozçelik bi beyanekê

girtina Osman Aytar protesto kir. Berpirsiyare kovarê yê Ewrûpa Halim Can li ser girtina Osman Aytar daxwuyaniyek pressê ji muesseê demokratik û humanist re şand û ji Amnesty International daxwaz kir ku mudexale bikin ku Osman Aytar bigihîje azadiya xwe.

Dûmahîk: r.11

Rojeva Mehe

## Pîvana Asriyetê

Çendekî berê di televîzyona şexsi ya Tirkan de a ku navê wê "Kanal 6" e, hevpeyivînek bi xwediyê rojnama "Ozgur Gundem" ê Yaşar Kaya re hat kîrin. Hevpeyivîn li ser pirsa Kurdî bû. Yaşar Kaya bi eşkereyi li ser êrişâ li hemberî rojnama "Ozgur Gundem" ê rawestiya, diyar kir ku ci zilm û zor li ser vê rojnamê heye, çawa nûçenîvis û xebatkarên wan ên din bi destê hêzên tarî yên dewletê tênen kuştin, û çend dawe di mehkeman de li hemberî wan hatine vekirin û doza çiqas cezayê hefs û peran li wan tê kîrin. Ewî di wê hevpeyivînê de rûresi, êrişkarî û nijadperestiya dewleta Tirk li hember muesese û insanên Kurd xweş diyar kir, sehetâ wî xweş...

Lê di pirsa meselêni di nav Kurdan de û bi taybeti jî di pirsa mewqufî li hember Kurdîn Îraqê de, şela wî gelek balkes û ciyê mixabîniyê bû. Procêkerê (programçekirê) televîzyonê, pirsa wê yekê jê kir ku rojnama wan her çendî xwedî li pirsa Kurdî derdikeve jî, lê gava dewleta federe ya Kurd li Kurdistanâ Îraqê hat îlankirin ew çima li diji wê rawestiya. Mîrik digot "rûpelên rojnama we bi xeber û meqalîn li diji tevgera Kurdîn Îraqê û li diji dewleta federe dagîrtî ne, çima?"

Bersîva Yaşar Kaya ev bû ku digot, Kurdistanâ Tirkîyê ji civaka eşîtiyê xelas bûye, iro kes nabêje ez ji filan eşîrê me lê dibêje ez Kurd im. Lê Kurdistanâ Îraqê civakeka eşîrî ye, eşîr di tevgerê de giran in, serokê tevgerê serokeşîr û feodal in, loma jî dewleta ku hatiye avakirin, ne dewleteke asri (modern- hemdem) ye, loma jî em li hember in.

Tesbita Yaşar Kaya ev bû, loma jî her roj rûpelên rojnama xwe bi xeber û meqalîn li diji dewleta Kurd dadigirt. Heyhat! Ci tesbit! Ci mewquf û ci Kurdi!

Gava insanekî wek Yaşar Kaya, ku xwe ronakbîrê Kurd dihesibine, bûye xwedî û berpirsiyarê hin muesesêni Kurdî û dixwaze serkêsiya tevger û daw û doza Kurdî bike, di rojek wek iro de jî rabe û tesbîtek wiha bike, ne mumkun e ku meriv matmayî nemîne û heyfa xwe bi rewş û rebeniya me Kurdan neyne. Li hember tesbîtek wiha meriv nizane gelo bikene yan bigirî.

Carekê tesbîten Yaşar Kaya yên di derheq hem Kurdîn Kurdistanâ Îraqê hem jî yên Kurdistanâ Tirkîyê de ji rastiyê dûr in. Ne Kurdistanâ Tirkîyê bi qasî ku ew dibêje ji civak û bîr û baweriya eşîtiyê xelas bûye, ne jî Kurdistanâ Îraqê bi qasî ku ew dibêje di nav eşîrî û feodalîyê de maye. Yekî ku piçekî hay ji Kurdistanâ hebe wê bibîne ku li Kurdistanâ Tirkîyê eşîrî çuqas mabe, li Kurdistanâ Îraqê jî kêm zêde ewqas maye. Di mesela xwe Kurd dîtinê de jî, Kurdîn Kurdistanâ Îraqê ji Kurdîn Kurdistanâ Tirkîyê pîrtîr hay ji Kurdiya xwe hene. Kurdistanâ Tirkîyê 50-60 salan di bin nijadperestî û asîmîlasyona Tirkan de ma, şûra Kurdiyê bi salan hat tepişandin. Hişyarbûna ku peyda bûye jî, hişyarbûna van du-sê deh salân dawîn e. Lê li Kurdistanâ Îraqê ev 60-70 sal in ku şerekî Kurdayetî yê bêwestan û bê navber heye. Di netîca vî şerî de hin maf û azadî û imkânîn pêşdebirîna bîr û baweriya Kurdiyê hatine bidestxistin ku ev tiş hîn li Kurdistanâ Tirkîyê bi dest jî neketine. Helbet hin ferq di navbera civakîn herdu perçan de hene, lê ne bi wê mahnî ku di warê civakî û Kurdayetiye de Kurdîn Kurdistanâ Tirkîyê ji yên Kurdistanâ Îraqê pêşdetir in.

Ya din ku Yaşar Kaya dibêje: Dewleta Kurd a Federe ne asri (hemdemî) ye, loma ew li hemberî wê ye. Gelo çima ne asri ye, li gor ci ne asri ye? Ma li Îraqê dewleteka demokrat a xwedan maf û azadiyîn milî û insanî heye û Kurd li hemberî vê dewleteka diktator û paşdemayî ava dikin ku Yaşar Kaya dibêje ev ne asri ye. Yan Yaşar Kaya li Kurdistanâ dewleteka ji wê millitîr û demokratîr ava kiriye û ew jî li gorî vê paşde maye loma li hemberî wê ye?

Ma dewleta Kurd ne asri ye, gelo diktatoriya Saddam yan dewleta nijadperest û terorist a Tirk asri ye? Yan halê me Kurdîn Kurdistanâ Tirkîyê, ku ji ber terora dewletê em nikarin rojnamekê an weqfekê bijinin ev hal esri ye?

Helbet dewleta federe ya Kurd, xwedana gelek kîmasiyan e. Dewleteka nûavakiriye, ji alî mîletekî perişan ê warwêran, bêxwendan û bê imkaniyet hatiye avakirin. Çar aliyan wê dijmin in pê dilisîn, êrişan dibin ser, rî û imkanan li ber dibirin ku xwe ava neke, bi cih nebe û pêşde neçe. Ci roja ku fîrsend di destê van dijminan keve jî ji wan bê wê vê dewletê hilweşinîn. A ev dewlet ewqas jî di bin tehdîd û xeterê de ye. Teví vê jî, bi naveroka xwe û bi millibûn û demokratbûna xwe ji dewletê dora xwe hemûyan jî asrîtir e. Di nav me Kurdan de ji mueseseyeka herî pêşdetir e, loma ji alî me ve jî muesesa herî asri ew e.

Wezîfa Kurdîn xwenas û şûrimillî ew e ku xwedî li vê dewletê derkevin, li hember tehdîdîn dijmin û xeteran wê biparêzin, hewl bidin ku ev pêşde here, xurttir bibe û ji alî asriyet, medeniyet, demokrasî û milibûnê de jî xurttir bibe. Heke ji me tê em wê çêtir bikin û muesesêni ji wê çêtir ava bikin. Û ji me neyê jî qene em pîjikan di tekerê wê ra nekin. Yan na emê li ber çavê dost û dijminan îspat bikin ku ne ku ev dewlet, lê em bi xwe ne asri ne, em bi xwe ji berjewendiyê xwe yên millî bêhay in.

## Tirkîye û işkence

Jack Healey û Maryam Elahî: "Qîrînêni ji qereqolêne Tirkîyê bilind dibin wê wijdanê Tirkîyê û dinê hîn jî bêşînîn"

Roja 6'ê Çileya Paşin di rojnama International Herald Tribune de li ser Tirkîyê û işkenceyê meqaleye derket. Meqale ji aliye du berpirsyarê Amnesty International Jack Healey û Maryam Elahî ve hatibû nivîsandin.

Meqale dide diyarkirin ku hukûmeta Demîrel soza xwe negirtiye û li Tirkîyê işkence nedaye sekinandin. Berevajî işkence li Tirkîyê hîn zêde û firehtir bûye. Ji işkenceyan 3 mîsal tên dayîn. Ji van du mîsal li Kurdistanâ qewimîne.

Em bêşekî ji vê nîvîse li jîr pêşkêş dikin; "Ew sozên serokwezîr Demîrel ku 'emê li Tirkîyê işkencê rawestînin' gotinê vala derketin. Li Tirkîyê, bi taybeti jî li qereqolan işkence bi awakî sistematiq û fireh dom dike..."

Ji van bûyeran yek, kuştina keça Kurd Bişeng Anik e. Anik, meha Adara çûyî li Şîrnexê hate girtin. Ew li qereqola polîs mir. Dema diya wê çû cesedê wê bîne,



Bişeng Anik di 24'ê Adara 1992'an de, bi işkencê hat kuştin.

dît ku serê keça wê ji nîvî ve bi gullan perçê kirine, neynokên wê rakirine, pêçikên wê şikandine û di laşê wê de birînê şewatê hene...

Di meha Nîsanê de, li Mêrdinê, di operasyonekê de komek

leşker, lawikekî 16 salî ji mala wî derdixin, bi xwe re dibin. Leşker agir vêdixin. Pişti agir vêdimre, lêwîk li ser koza êgir li ser pişte dirêj dikin. Vî karî 4-5 caran dubare dikin. Dûre bi fikra ku lawik mirîye, cedîdê wî li wê dihelin. Mücîze dibe, lawik namire. Sivanekî ji wir derbas dibe lêwîk dibîne.

Roja 27'ê Nîsanê hemşîreyeka 23 salî ku navê wê Nazli Top e, li Stenbolê tê girtin. Di gel ku Nazli bi himl e jî li qereqolê işkencê pê dikin. Nazli tişte anîne serê wê wiha tîne zîmîn: 'Bi cop tecawuzî min kirin. Dûre xwestin bi şüşê tecewuzî min bikin. Pişti ku min got ez bi himlim li zikê min xistin'

Jack Healey û Maryam Elahî dibîjîn ku; "Qîrînêni ji qereqolêne Tirkîyê bilind dibin wê wijdanê Tirkîyê û dinê hîn jî bêşînîn"

## Listeya mirinê ya Hizbulâh

Amnestyî listeyek ku ji aliye Hizbulâh ve hatiye hazirkirin, çap kir, ji bo tedbirîn pêwist bigre, hukûmeta Tirkîyê haydar kir. Di listeyê de navêni 28 kesen ku wê bêne kuştin hene. Ji vanan 12 parlamenteleren HEP'ê û 4 jî yê SHP'ê ne. Lê xususuyeta muşterek ya van parlamenteleren ew e ku, hemû jî Kurd in. Ji xwe di listeyâ 28 kesan de, bes 3 heb ne Kurd in. Ev liste beriya kuştina Musa Anter hatiye bi destxistin û Tirkîyê hatiye agahdarkirin. Amnestyî Tirkîyê ji ber bêtedbîriyê súcdar kir.

Di listeyâ mirinê de ev kes hene: Leyla Zana, Sedat Yurdas, Hatîp Dicle, Zubeyîr Aydar, Dogu Perînçek, Yalçın Kuçuk, Musa Anter, Mahmut Alinak, Ahmet Turk, Sedat Edîp Bucak, Salih Sumer, Mahmut Uyanik, Sirri Sakîk, Muzaffer Arikân, Adnan Ekman, Orhan Dogan, Selim Sadak, Nîzmettin Toguç, Abdulkârîm Zilan, Mehmet Sîncar, Yavuz Bînbay, Cebbar Leygara Sekvan Aytug, Bariş Muştakhan, Haşim Haşimî, Faik Tunefan, Omer Hazar, Ata Soyer.

## Li gor rapora IPI ya azadiya çapemeniyê Kurdistan herêmeke xeter e

IPI (Enstituya Çapemeniya Navnetewi) her sal rapora azadiya çapemeniyê belav dike. Di ya îsal de ciyekî mezin daye Tirkîyê û gotiye ku "Kurdistan ji bo rojnamevanan yek ji heremîn herî xeter yê dînyayê ye. Bes li vê herêmî rojnamevanan ku hatine kuştin 12 ne. Ji ber ku failen van cînayetan yek jî derneketiye, loma jî hukumet tê súcdarîn, tê gotin ku tiliya wan tê de heye"

Hin rîxistinê ku azadiya çapemeniyê dixwazin ji ber kuştina rojnamevanan, Tirkîyê súcdarîn. Yek ji van rîxistin "Article 19" ye. Vê rîxistinê navê xwe ji madda 19 ya Beyannâme Mafen Mirovi ya Netewen Yekbûyî girtiye. Berpirsyarê rîxistin Francis d'Souza got "Li Tirkîyê di kuştina rojnamevanan de rola hukumetê heye. Wek tê fêm kirin hukumet Tirkîyê ji bo eqaliyeta û taybeti jî ji bo ku pirsa Kurdan di zeftê de bigre, rojnamevana dikuje.

Sekreterê Gişî yê IFJ (Federasyona Navnetewi ya Rojnamevanan) Aidan White, di mesaja xwe de, ji aliye rojnamevaniye de, dema qala herêmîn xeter kir, Tirkîyê û Yugoslavya wek hev girt. White got sala çûyî li hemû dînyayê 39 rojnamevan li ser kar, 23 rojnamevan ji ji ber karê xwe hatin kuştin.

## "Ozgur Gundem" hat sekinandin

Rojname Ozgur Gundem ku ji aliye Kurdan ve dihat derxistin roja 16'ê Çileya Paşin rawestiya. Rojname 228 rojan derket.

Xwediye rojname Yaşar Kaya; di nîvîa xwe de sedemî rawestandin, kuştina 7 rojnamevanan rojname, pêşîlegirtina belavbûyîna rojname û sedemî maddî nişan da. Li gor Y. Kaya rojname mehî mîlyarek lîrîyê Tirkî zerar dikir.

Yaşar Kaya got: "Dewlet û hêzên wê, xwest me, yanî Yeni Gündemî bifetisine. Yanî ku bi gulleyan nikaribûn dengê me bibirin, icar xwestin bi ambargoya aborî me bifetisîn".

Li gor xwedi, wê rojname xurttir vegere.

Di nav wan heft meh û nîvîa rojname û xebatkarêne, xebatkarêne, Musa Anter, Huseyin Deniz, Hafiz Akdemir, Yahya Orhan, Kemal Ekinci, Halil Adanir û Lokman Gunduz hatin kuştin.

### Armanc

Rojname Kurdi ya mehane

Monthly Kurdish Magazine

#### Redaksiyon:

M. Eli

Zinare Xamo

Hesen Mizgin

Mirza Bextiyar

Lewend Fîrat

S. Rêving

M. Lewendî

#### Redaktörê berpirsyar:

M. Eli

Berpirsiyare besê

Dimilki: Malmisanij

#### Adres :

Box: 152 16  
161 15 Bromma

Sweden

#### Telefon

46-8-803135

#### Telefax:

46-8-801825

#### Utgæs av:

Kurdiska

Demokratiska

Arbaterunionen

Postgiro: 50 37 99-9

ISSN: 0348 7385

#### Abonetî

#### Prenumeration

Abonetîya Salekê

Li Skandinaviya

200 SKR

Maqam

Myndigheter

400 SKR

Li Ewrûpa

50 DM

Li derveyî Ewrûpa

40 \$

#### Anons/ilan

nîv rûpel/ en halvsidan

2500 SKR

# Komeleke Federasyonê li Kurdistanê mektebek ava kir

(Firat Nemrûd)

Komela Kurdistan Li Eskilstunayê (bajarekî Swêdê) bi alîkariya Komîta Swêdî û Mekteba "Stâlforsê" li Eskilstuna-yê, li Kurdistana Başûr li gundê Xalekan mektebek ava kir.

Di destpêka 1992'an de ji bo avakirina mektebê projeyek hat amade kirin. Li gor vê projeyê 50 000 Kron mesref lê diçe. Komelê ji bo peydakirina vê mesrefê muracaati gelek dezgeyên Swêdî û Kurdan kiriye. Her weha şev jî amade kiriye.

Komelê di Hezîrana 1992'an de dest bi kar û barê avakirina mektebê kiriye.

Avakirina mektebê di parlamento Kurdistana Federe de ji hatîye behs kirin. Parlamento bi vê wesileyê sipasîyên xwe pêşkêşî Komela



Mekteba ku ji aliyê Komela Eskilstuna ve hatîye ava kirin (F. Barzan)

Kurdistanê Li Eskilstunayê kiriye.

Komela Kurdistanê Li Eskilstunayê di 1986'an de ji ali Kurdê hemû besêne Kurdis-

tanê ve hatîye avakirin û yet ji endamên herî aktif a Federasyona Komelê Kurdistanê Li Swêdê ye.

## Kongra Rêxistina Ewrûpa ya YEKBÛN'ê

Kongra rêxistina Ewrûpa ya YEKBÛN'ê civiya û du rojan dom kir.

Kongre li ser girîngiya avabûna YEKBÛN'ê, guherînî li dûnyayê, rewşa siyasi ya welat rawestiya û li ser pêwistî û girîngiye xebata li derveyî welat sekînî.

Herweha kongrê programa xebata rojên pêş qebûl kir û ji bo xurtkirina têkoşîna netewî û demokratik hin bîryar girtin.

Hin nuxtên ji perspektif û programa xebatê ev in;

- Komite bi hemû hêzên Kurdistanî -ku li Ewrûpayê tê temsîlkirin- re têkiliyên dosta-nîyê berdewam dike. Ji bo kar û barê Kurdistanî bi hev re karkirin wê bibe politika esasi ya partiya me.

- Partî wê hewl bide ku li hemû welatîn Ewrûpayê, federasyonê demokratik wek a Swêdê bîn avakirin.

- Partî dibe alîkara avakirina muesesên pişeyî, meslegî ên Kurd li derveyî welat. Herwisa dibe piştgira muesesên heyî yên bi wî rengî.

- Li hin welatîn Ewrûpa kovarênu Kurdistan didin naskirin, bûyer û nûçeyên welat dighînin raya gişî, hene. Partî wê alîkariya kovarênu demokratik û objektif yên bi wî rengi bike. Li welatîn

belav kir. Di belavokê de bangî dilxwaz û welatparêzên li derveyî welat dike:

"Rewşa xerab ya welatî me li ber çavan e. Ji bo vê rewşa dijwar ya gelê xwe baştır bikin, li Ewrûpayê jî karênu em bikin gelek in. Ji bo vê jî fedekarı, xebat û rêxistin divê.

Emê, wek YEKBÛN rêxistina Ewrûpayê, bi qerardarî bixebeitin. Em bangî hemû welatperweran dikin ku di vê xebata me de mil bîdin me".

## Konferansa sêyem ya RNK ya liqê Ewrûpa

Konferansa sêyem ya RNK (KUK) di rojê 25 û 26'ê Çileya Pêşîn civiya.

Konferans ji ber ku çend mehan pişti kongreya 4'êm ya RNK civiya, ji pîrs û pîrsîrêkîn siyasi, rêxistinî û guherînî li dûnyayê û welat zedetir, giranî da ser kar û barê xebata li Ewrûpayê.

Li ser konferansê, berpisyarê Ewrûpa ya RNK beyanek da. Di beyanê de ji hin perspektif û qadêne xebatê weha hatine rîz kirin.

"Di van salên dawî de, li welatîn Ewrûpa bêkarî, dijiminatiya biyaniyan û tevgerên Neo-Nazîstan, tengkirina sinorêne heqê penaberiyê, aborî û de-

mokratî, roj bi roej xerabtir dice. Ev bûyer, béguman li ser civata Kurd ya li Ewrûpa jî tesîrek berbiçav dike. Divê em li hemberî van bûyer û guherandinan bêtir haydar bin, politikayek aktiftir bidin pêsiya xwe û bi avayı û hêzîn demokratik re xebat û têkoşînek berfîre û hevbes bimesînîn".

"Ji bo kû xebat û têkoşîna gelê Kurd ji alî raya gişî bêtir bê naskirin û piştgîriya wan bi doza me re xurtîr bibe, divê xebat û hewildanên pêwist bêne kirin. Herweha divê piştgîriya xebat û hewildanên û warê ziman û kultura Kurdî de tê meşandin, bê kirin û xebat û hewildanên di vî warî de bîghîjin hevdî.

## Mahkema Navnetewi daxwaza gundiyyêne Cinebirê qebûl kir

**Mahkema Mafên Însanî a Ewrûpayê di 12'ê Çileya Paşin de li Strasbûrgê civiya û muracata gundiyyêne Cinebirê qebûl kir.**

Wek tê zanîn di 14'ê Çileya Pêşin a 1989'an de Serleskerê Tirk Cafer Teyyar pîsîtiya însan bi gundiyyêne Cinebirê dabû xwarin. Gundiyan Cafer Teyyar dabûn mahkemê, lê mahkemê ew berat kribû. Li ser vê helwesta dewleta Tirkîyê, li ser navê gundiyyêne Cinebirê Abdurrahman Muştak, Bahatin Muştak, Kamil Muştak û Abdulah Gündogan bi riya abûqatên xwe muracatî Mahkema Mafê

Însanî a Ewrûpayê kirin. Mahkema Mafe Însanî a Ewrûpa di 12'ê Çileya Paşin de li Strasbûrgê civiya û muracata gundiyyêne Cinebirê di cî de dît. Bi vî hawî jî rûreşîya dewleta Tirk di vî warî de eşkere kir.

Berî ku komisyonâra Mahkema Strasbûrgê bice, di 11'ê Çileya Paşin de hêz û partîyên Kurdistan; YEKBÛN, PSK, HEVGIRTIN-KDP, KAWA, PRK, KKP, TSK li Strasbûrgê ji bo gundiyyêne Cinebirê meşke piştgîriye çekirin.

NEYNIK

## Ev çawa realîstî ye?

Reşîd Burhan

Béguman mafê her kesî heye ku nérînên xwe rast bibîne û wan pêşkêşî xwendevan bike. Ev hêla huquqî ye. Hêla psikolojik ji, mirov tim dixwaze nerînên xwe realist bibîne. Di bingeha nérîn de, motîfînî interesan roleke mezin dileyiz. Di hêla din de gava ku nérînên tê parastin bê kirîter û mezin bin, wê gavê bi qasî hejmara kesan, hejmaren realistîyê tê holê. Bi kurtauî realistî namîne, lê her tevîheviya lênerînan dimîne. Li gor min, meqala H. Mizgin babetekî wiha ye ku mirov dikane pir rexna lê bigre. Lê ezê bi çend xalan rexnên xwe bi sinor bikim. H. Mizgin di hejmara 134'an a Armancê de weha dînivise.

1- "Hêzîn Kurdistanira Iraqê, Iranê û Suriyê ji mêj ve, ji roja ku partîyên xwe, rêxistinên xwe ava kirine rastîyeke xwe anîne zîmîn. Ji Kurdistanira Tirkîyê PDK û PSK ev rastî anîne zîmân... Daxwaza "Kurdistan serbixwe" do cîqas xeyal bû iro jî xeyal e. Daxwaza "otonomiyê", "federasyonê" an ji konfederasyonê daxwazeke realist e".

a) Realistî ji bo daxwazeke stratejik:

Otonomi? Realist e. Federasyon? Realist e. Konfederasyon realist e. Bi rastî pîrr hejmaren realistîyê çêbûn. Ev ji realist e, ew ji realist e, ewa din ji realist e! Zanîstiya politik bû wek pêkenînê Xoce Nesredin. Gava mîzîn û krîterê realistîyê ne xwiya bin, merov realistîyê weha dikuje.

b) Partîyên bingehîn ên Kurdistanira Suriyê, ne otonomiyê, ne federasyonê û ne ji konfederasyonê diparézin. Xwestînên wan ji otonomiyê ji hindikir in. Nêzîki mafên kulturî û însanîye ne. Mafê kulturî, ma ev ji realist e? Divê H. Mizgin vê ji bêje. An ji hêzîn beşê Kurdistanira Suriyê rastîyen xwe neanîne zîmîn. Ku ne weha be, ev tê vê manê ku haya H. Mizgin ji programê hêzîn Kurdistanira Suriyê tuneye.

c) Ku xwestîna serxwebûna Kurdistanê xeyalperestî be, divê PSK ji hêlezî realist be, ji hêla din ji xeyalperest be. Ji ber ku di programma PSKê, a berî kongra 1992'an de ev heye: "Gelê Kurd kare cihê bibe, dewleta xwe ava bike, yan ji bi gelê Tirk re yekîtiyeke demokratik hilbijêre". Gelo li gor mantika H. Mizgin, PSK ne "nîv" realist û "nîv" ji xeyalperest e?

2- "Di pîrsa 'otomomi', 'federasyon' an ji 'konfederasyonê' de serê min ne zelal e". Çawa dibe, serê meriv ne zelal be û mirov karibe bibe xwedîyê iddiâ realistîbûnê? Xuya ye H. Mizgin ji bo metoda zanîstiye formuleke nuh dîtiye.

3- "Konfederasyon" ji bo damezirandinâ hinek strukturên dewletê; Yekîtiya dewletên serbixwe ye. Li ser bingehîn peymanê navnetewi tê damezirandin. Dewletên endamên konfederasyonekê ne "serbixwe"ne. Dewletên serbixwe ji, bê sinor nabin. "Xerakirina van sinoran guherandina xerîta Roljhilata Navîn tîne rojevê. Ev yek ji bo min ne realist e". Wê gavê emê çawa xwestîna "konfederasyonê" realist bibînî? Li gor H. Mizgin divê konfederasyon ji ne realist be, xeyal be. An ji nîvîskarê meqâlê mana "konfederasyonê" nîzane.

4- Bi rastî dewletên ciran û ên bi qewet ji guherandina sinoran ne razî ne. Lê gava em siyaset û xwestînên xwe yê stratejik li gor qebûlkirina wan dewletan eyar bikin, divê em dev ji federasyonê ji berdin. Ji bo ku ev dewletana ji bo Kurdistanira Bakur bi federasyonê ne razî ne. Bêtir bi mafê kulturî û însanî razî ne. Wê gavê xwestîna federasyonê ji ji destê me cûl Konfederasyon berê ji destê me cûbû, nuha ji federasyon çû. Ma "otonomî". Lê ji bo "otonomiyê" ji ev dewletên bi qewet tişteki zelal nabêjin û ji bo rûniştina li dora masê divê komporis hebe. Xuya ye dibê em ji xwestîna "otonomiyê" ji dakevin. Ma cîma nebe? Ku xwestîna partîyên beşê Kurdistanira Suriyê realist be, cîma daxwaziyêne Kurdîn Kurdistanira Bakur yêni otonomiyê ji kîmtir wê ne realist bin? Gava mirov xwestînên xwe yê stratejik li gor biyaniye eyar bike, serê mirov wê wusa li keleman keve û mirov tîşten weha tevîhev bîbêje. Xuya ye me Kurda ji tarîxa xwe hîn tecrûbe nestendîye.

5- "Ne dewletên li der û dora Kurdistanê vê yekê qebûl dîkin û ne ji dewletên di "pergala nû ya dîn" de xwedî soz û qewet in ku vê yekê qebûl bikin". Bi vê lînérîn xuya dibe ku H. Mizgin politika navnetewi a dewletên bi qewet statik dibîne. Qebûlkirin an ji ne qebûlkirina van dewletan, wek politika navnetewi ne statik e. Ku mirov ji mekanîzma politika navnetewi fam bike, mirov nikane tişki weha bêje. Çimkî mekanîzma politika navnetewi bi formek (şikil) dinamik dixebe û fonksiyona xwe bi cih tîne. Çewa?

1- Ev dewlet politika xwe ya navnetewi li gor xurtbûn û qelsbûna hereketa netewi diguherîn. 2- Ev dewlet li interesen xwe dinîrin, gava interesen wan tê guherandin, politika wan ji diguhere. 3- Dijitiya navbera dewletên kolonyalist û van dewletan de dice sedemîn ku politika wan ji bê guherandin. 4- Dijitiya di navbera dewletên mezin de, dîsa dice sedemîn ji sedemîn ji bo hînek ji wan dewletan politika xwe biguherîne. 5- Qarekterê politika hundir a van dewletan formî dide politika wan a navnetewi û politika hundir a van dewletan dinamik e, ne statik e. Béguman divê em politika navnetewi a van dewletan têxîn hesab, gava em takîfîn xwe ava bikin. Lê ne bi hawakî statik, bi hawakî dinamik divê em li politika wan binérin. Ku em xwestînên xwe yê stratejik li gor politika wan dewletan ava bikin. Wê gavê emê bibin quqla xelkê, serê me wê li gelek keleman keve. Ev nayê wê manê ku emê politika van dewletan ji binî de ji hesêb derxin.

6- Wek xwendevanekî Armancê tê nagîhem ji bo ci "sinoran ku Kurdistan me kirine çar perç, me bîvê nevê, bûye rastîyeke dîrokî"? H. Mizgin van sinoran Kurdistan kirine çar perç wek neheqîyeke tarixi ya nayê guherîn dibîne. Wê gavê divê sinoran Yugoslavyayê, Çekoslovakîyayê û yê YKSS (CCCP) bêtir bibana dîrokî. Lê nebûn.

Eme kinga bibin realist? Li gor min kinga me nérînên xwe li ser faktâ ava kirin û ev nérîn li bêjîngâ dîrokê û mantikê xistin...

# Parastina zimên û karûbarê zimanzanen

Di hejmara Armancê ya 134'an de heval Mahmûd Lewendi ji bo parastina zimanê Kurdi nivîsek nivîsandibû. Bi ya min ew meqale bi awakî rast hatibû nivîsandin. Tişten ku wî gotibû di cih de bûn. Lî vi hevalî ev doz bi awakî gelempîr anîbû zimên. Bi ya min alîkî wê nivîsê kêm bû. Ew jî dî parastina zimên de kar û barênu ku dikevin ser milê zimanzanen bû. Ji ber ku divê ji alîki ve meriv zorê bidê ku xelk bi zimanê xwe biaxise û ji aliyê din ve ji meriv nehêle ku ziman bi şâşî û çewtiyên ku çê dibin bîrinênu kûr bigire. Ev doz bi du alîyan tê parastin. Alîki ku kek Mahmûd bi xwe jî gotibû, bikaranina zimên di nav gel de, da ku zimanê me wenda nebe û em wek netewe nehêlin. Aliyê din ji (ku ev alî pirtir dikeve ser milê zimanzanen)parastina zimên ji çewti û şâşiyên gramitiki, ifadeyi û çekirina bêjeyan e. Bi Kurdi axaftin ji gel tê xwestin. Lî parastina zimên karê zimanzanen e. Ji ber ku zimanzanen me ci tişte rast yan jî çewt bikin dikeve nav zimên û jî wî re dibe mal. Pir bêjeyen ku em iro bi kar tinin do tunebûn, haya xelkê jî ji wan çenebûbû. Lî iro bi saya zimanzanen me ew bêjeyen han ketine nav xelkê. Dibe ku hin ji wan bêjeyan ne rast bin û ne dûr e ku zimanzanen me rojekê bi rastnebûna wan bihesin û bixwazin wan biguherin, wê çaxê dê héza wan ji bo rastkirina wan bejeyan têneke.

Di zimanê Erebî de kesen kiryar ê ku bi karê lêkerê radibin, bi qalibê "fail" çebûye û manaya wê jî kesê ku bi karê nivisanê radibe. Her weha bejeya "şari" bi qalibê "fail" çebûye, manaya wê li gor gramatika Erebî dibe: Kesê ku ava dike, lê di Erebî de "şar" weke kolan tê bikaranin, kolan bi xwe nabe kiryar û nikare bi karê lêkerê rabe, lê di vê bêjeyê de tenê waha hatiye û nav xelkê de weha belav bûye. Piş re pisporê ziman xwestinê vê çewtiyê rast bikin, lê nikaribûne, bi wî awayi ew bêje dêvla ku bibe "meşrû" bûye "şari" û waha çewt maye.

Ji bo me jî weha ye. Çewtiya ku em iro bikin, sibe rastkirina wê zahmet e. Lewra divê zimanzanen

me pir baladar bin. Bala xwe bide du tiştan.

1- Li hember bikaranina bêjeyen biyani yê Ewrûpi divê ew haydar bin. Çiqas ji desten wan tê divê nehêlin bêjeyen biyani têkevin nav Kurdi û heger ew bêjeyen ku ew bi kar tinin di Kurdi de hebin, wê gavê divê xwe qet vêtinkarê wan gotinan nebînin. İro di hemû kovar û weşanen ku li Swêd derdikevin de bêjeyen wek **struktur, abstract** tênik bikaranin. Gelo bêjeyen Swêdî ên ku niviskarêne me bi kar tinin di Kurdi de nînin. Bi ya min hene, lê ji bo hevalen me bi kar anina wan gotinan hîn hêşantir û hîn xweşir tê. Lewra wan bêjeyen bi kar tinin. Niviskarêne Kurdi ên ku li Swêd in di nivîsen xwe de bêjeyen Swêdî bi kar tinin, Kurdên ku li Fransa ne bêjeyen Fransizî bi kar tinin, ên ku li Almanya û li İngilistanê ne bi bêjeyen wan zimanen nivîsen xwe dixemlinin. Lî kesek ji wan nafikire ka di dawlyê de wê rewşa zimanê Kurdi çawa bibe. Jî xwe pir bêjeyen Tirkî, Erebî, Farisi ketine nav zimanê Kurdi. İcar em ji li ser navê zimanzan û pisporan bêjeyen zimanê Ewrûpi ku em li wan wela tan dijin têxin nav Kurdi wê gavê em başiyê nakin, em dijminatiya zimanê xwe dikin. Li gor nêriña min, dema ji me re bêjeyek hewce be, divê em pêsi di Kurmanci de lê biggerin, heger tunebe, icar em li nav Sorani û Zazaki biggerin. Heger di wan de ji peyda nebe, icar di nav zimanen nêzikî Kurdi de biggerin. Heger me di nav wan de ji peyda nekir, wê gavê divê em di nav Swêdî, İngilizi, Fransizî û yê din de lê biggerin. Lî ez bawer im ku zimanzanen me bê ku bi vî awayi li bêjeyen biggerin, raste rast diçin riya kurt û hêşan û nivîsen xwe bi bêjeyen biyani dixemilinin û bi vî awayi ji xelkê re rerebiya çewt dikin.

2- Parastina ziman ji aliyê morfolojiyê û vejan-dina bêjeyen nuh ve: Zimanzanen me dema bêjeyekê vedijenin bêyi ku li bêjeyen biggerin û serê xwe bi wê re bişşin, manaya wê bi Tirkî diramin û ji Tirkî werdigerin Kurdi û bi vî awayi bêjeyen nuh çê dikin û dixin nav zimên. Ji aliyê din ve jî pir bêjeyen Kurdi hene ku Ereban, Tirkan, Farisan ew girtine û xistine

## Perwîn Îzol

nav zimanen xwe û kirine bêjeyen Erebî, Tirkî û Farisi û zimanzanen me jî ji tunebûn û kembûna bêjeyen gazinan dikin. Xelkê bi gotinêne me zimanen xwe dewlemend kirine, em nikarin ên mayî ji biparêzin.

Riya rast ji bo çekirina bêjeyan ew e ku pisporen me pêsi di nav klasikên me de li bêjeyan biggerin, heger peyda nekirin û divê di nav zaravayen me de lê biggerin, li wir ji peyda nekirin, icar dikarin bêjeyen nuh çê biggerin. Dibe ku ji we re mantiqi neyê lê di nav ferhengen Tirkî de gelek bêjeyen Kurdi hene û Tirk wek Tirkî dixebeitin. Beriya 5 salan min ferhengeke Tirkî (ya Turk Dil Kurumu) danî ber xwe û min xwest bêjeyen biyani jê derinim. Min destereke mezin a bi bist peli tiji bêjeyen Kurdi jê derxist. Li ber hinekan nivîsandibûn Farisi. Li hember hineken din ji tiştek nenivîsandibûn, wek bêjeyen Tirkî derbas dibûn.

Ji wan çend nimûne ev in:

- agah: bilgili, uyanık, haberli
- aheng: uyum
- bac: gümruk vergisi
- dilderya: sabırı
- yeknesak: monoton
- şano: sahne
- şahnışın: Balkan
- serencam: Bir işin bir olayın sonu.
- sayeban: gölgelik
- sergerde: elebaşı
- peyrev: izinden giden izleyici.

Ji van numûneyen jorîn ji tê ditin ku pir bêjeyen Kurdi ketine nav zimanen cîranan û bûne wek ên wan zimanen û em ji dibeji: Zimanê me ne dewlemend e. Bi ya min zimanzanen me divê bibin parastvanen zimanê Kurdi û ku zimanê me bête parastin.

## Lêborîn

Di hejmara berê (134), de di nivîsen "Hêza Çaklıç û Kurdi" û çiroka Bekir Yıldız, Tiliyîn Spehi" de ji ber çewtiyek tekniki geleş şasi hene.

Ey çewti di du (132, 133) sermîvisen Celîle Celîl de ji dubare bûbu, di dell "Ked û Şekûdarî" yê de "Ked û Şikûdarî" hatubû nivîsin. Ji ber van çewtiyên xwe, em ji nivîskar û xwendevanan lêborîne dixwazin.

**Redaksiyon**

## Zinarê Xamo Sibe Dikane Dereng Be

Heta nuha min gelek caran bala serok û rîberên Kurdan kîşandîye ser tahlûka asîmîlasyonê. Lî ci heyf ku vê gazi û hawara min ew ji xewa wan a giran şîyar nekirin. Li gor gelek kesan min mesele pîr diramatize dikir. Lî rastî ew e ku rewş her ku diçê xerabir dibe, nîşen nuh radibin hema hema ji binde bi zimanê diya xwe nizanin. Bere bere zimanê malê û zimanê rojane ji dibe Tirkî. Di rewşek wiha de divê her kes ji tengâ xwe de vê munâqesê bîne rojeyê û ji peyvê wêdetir, di praktikê de tiştekî bike. Vê nivîsê ez bi vê armancê dinivîsim.

Gava meriv bibêje hebûna Kurden Kurdistana Bakur(Türkiyê) ji gelek alîyan ve di tahlûkekê de ye, wê ne mubalexe be. Ji van tahlûkan yek ji tahlûka asîmîlebûnê ye. Bi dîtina min di tarixê de Kurd wek millet tu carî rû bi rûyê tehdîsteke hewqas mezin nebûne. Li hember vê tehdîda asîmîlasyonê wek ferd, wek dezgez divê em hin tedbîren ciddî biggerin.

Wek têzanîn, ziman ne tenê wasitake axaftin û dan û standînê, her wisa ew, wasitake yekîtiya şikligirtina rûhî ya milleteki ye ji. Wexta di nav milleteki de yekîtiya zimanen tunebe, ew millet di gelek warê din de ji ji hev dûr dikeve, dibe xeribê hev û hetta wek "nation" berdewambûna hebûna wî ji dikeve xeterê. Heta bi umîmîyet wenda dibe.

Hinek dikanin di warê teoriyê de rabin li dij vê dîtinê derkevin û hin numûneyen eksê wê nîşan bidin; bibêjin "gava milletek zimanen xwe wenda bike, ev nayê wê maneyê ku wek millet ew ji dihele, namîne."

Dibe ku tişte ez dibêjim li teoriyên iro hene, neyê û li dînayê ji hin numûneyen eksî vê dîtina min hebin. Lî li gel vê ji ev nayê wê maneyê ku ev yek ji bo Kurden ji rast e û heger Kurd zimanen xwe wenda biggerin ji wê wek millet kanibin hebûna xwe bidomin. Beri her tişte rewşa me Kurden pîr istisna ye, qet naşibe rewşa milleteki din. Ne bi rengê xwe û ne ji bi dînê xwe em ji wan milleten ku welatê me îşxal kirine naqetin û di ser de ji em di nav hev de ne. Ev faktor giş di lehê dijmin û di eleyhê me de ne. Ji ber vê yekê ji wê ne rast be gava em bibêjin nîzanim "filan millet asîmîle bû lê disa wenda nebû. "Bê guman li dunyayê dikane hin numûne bîn dîtin. Lî li alî din gava em li der û dora xwe binêrin, hema di nav Ereban de, di nav Tirkan de em dikanin gelek numûnan bibînîn ku millet çawa asîmîle bûne, bûne Tirk yan Ereb.

Bî dîtina min tişte heta niha wek millet em ji wendabûnê xelas kirine, ziman e. Çimki yê em û Tirk, Ereb û Faris ji hev gerandine di esasê xwe de ziman e, kultur e. Heger Tirkan wek milleten din em ji asîmîle kiribûna ne qonaxa têkoşinê û ne ji daxwazên me yê millî wê wek iro fireh û xurt bûna. Li gel vê xebata berfireh û bi hezaran şehîd ji Kurd li Kurdistana Bakur disa ji ketine xeteke wendabûnê. Heger ev qonax dirêj bajo û dinav van çend salen pêş de em heqekî millî bi dest nexin, wê renge gelşê ji bin de were guherandin, "tahlûka çebûna dewleteke Kurd" wê ji Tirkan re nemîne. Piraniya me wê ji mecbûri bibe Tirk. Çimki tu xusûsiyeten ku milleteki dikin millet wê bi me re nemînin. Li hember vê feleketa mezin divê em tiştekî biggerin, tedbîrekî biggerin. Ev ji bi organizasyon, bi ser û ber dibe.

Tu idîsal bêyî fedekarî bi rast nagere. Helbet ji bo rastgeran-dina idialek wisa mezin ji, yanî avakirina dewletekê organîzasyon lazim e.

Hemû parşî û dezgehêne ku hene di piraktikê de nîşan dane ku li dij asîmîlasyonê ew siyaseteke rast, siyaseteke ku kanibe rî li ber vê feleketa millî bigre nameşinîn û ji bo pêşerojê ji program û dîtenek wan tuneye. İcar ji ber vê yekê ji meriv nîkane avetina gaveke ciddî ji wan bipê. Bila gaveke ciddî ji li wir bimîne ew kes û grûbîn ku dewletê hîn asîmîle nekirine, bi gelek rîyan û aletan ew asîmîle dikin. Wek numune, nuha li Kurdistanê hêzên Kurden gelek kovar û rojnaman derdixin. Bêyî yekê (Welat, rojnameyeka hefteyî ye), giş bi Tirkî ne. Ya bi Kurdi derdikeve ji him ji alî şikil û him ji ji ali naverok û kadi-rên xwe ve pir zeif e, ne mumkûn e ku kanibe bi yê ku bi Turki derdikevin re reqabetê bike. Yen ku bi Tirkî derdikevin ji her yek nîv rûpel ya ji rûpelekê, piranî bi tişten pîr basît, bi çend rîzân folklorik û ew ji bi zimanekî tewşo mewşo cî didin Kurdî. Ü bi bo ku meriv kanibe wan fahm bike divê Tirkî me-re pir xurt be. Ew ji dibe sebeba ku millet bi Kurdi nexwîne. Di neticê de him dewlet û him ji hêz û partiyen bi neta ku ewê millet xelas kin, bi gelek aletan milet asîmîle dikin.

Divê ev siyaset, bê guherandin, ev qonax bê rawestandin. Divê ji bo vî karî tevgereke nuh bi daxwaz û pirensibûn radikal derkeve hember gel û li hember asîmîlasyonê hin gavê muhîm bi lez bavêje. Wezîfa vê tevgereke divê bes xebata li dijî asîmîlasyonê be. Ji bo pirensibûn serihandanek, tevgerek weha pêşniyaren min ev in:

-Divê di hemû civîn, dan û standinê bi endaman re, (ci bi devkî û ci ji bi niviski be) bi Kurdi bê peyivin.

# Zimanê Kurdi

Ji ber ku zimanê Kurdi zimanê miletikî ye ku hatiye bîndesthiştin, di îmkana pêşdextistina muesesetiya mili, ji ya lêkolîn û lêgerîn û pêşxistina ziman, kultur û hebûnê civakî û tarixî hatiye bêparhiştin, zimanê Kurdi jî têra xwe nehatiye lêkolîn û dewlemendiya wî nehatiye eşkerekirin. Mueseße û dezgehîn ku karibin vî zimanî pêşbi xin bi taybetî li hundurê welêt fîrsenda avabû-nê nedîtine, ji alî lêkolîn û lêgerînê ve zimannasen pîspor yê bikêrhatî negîhiştine, yek du ronakbirênu ku bi îmkan û hewlidana xwe ya şexsi xwesrine derkevin meydanê jî, hergav tûşî tehdîda dewleta serdest û zordar bûne.

Loma jî, lêkolînen li ser zimanê Kurdi, heke em rewşa îstisnaî ya Kurdistana İraqê li ber çav negrin, bi îmkanen van çend ronakbiran mehdût kîriye ku ew jî xwe re li deriveyi welat peyda kirine. Li Kurdistana İraqê, ji ber wê serbestiya nisbi ya kulturi ku encama têkoşîna mili ya bêwestan û bênavber bûye û piştre jî ji ber wê îmkana otônomiya mehdûtkirî ya berherma şerê salên 60'ı, li vî perçê welatê me, welê lê hatiye ku hejmara ronakbir û muesesên ku li ser zimanê me xebat kirine, ta de-receyekê zedetir bûye. Li vî perçê welêt meriv dîkare behsa hin xebatê hêja bike. Ji bili van tiştîn ku li ser zimanê Kurdi hatine nivîsin, eserên hin rojhîlatnas û zimannas, gerrok û misyonerên biyanî jî hene.

## Ji bo armancen siyasi

Ji bili vê divê em xebatêwan dewletênu ku Kurdistan bindesti kirine û yêni hin der û dorênu ku hin hesabênu wan li ser Kurdistanê hene jî destnîşan bikin, ku ev xebatêni wiha yêni li ser zimanê Kurdi ne bi mexsedâ ilmî lê bi ya siyasi hatiye kirine. Ewan ne ku xwesrine rastiyen zanistî derxin hôlê, lê xwestine idia û safseten ku xizmeta mexseden wan ên siyasi bikin li nav miletê bêne belavkirin. Dewleta Tirk ji ber ku heta roja tro hebûna miletê me încar kiriye, û di riya xebatêni behskirî re muhawele kiriye ku Kurdan wek perçeyekî ji qewmîn Tirk ên Asya Navin bide nişandan. Li ser zimanê Kurdi jî idia kiriye ku ev ziman, zimanê civakeke Tirkijad(Tirkîn çiyayı) e û di netîca asimilasyonê de bûye zimanekî destkird(sun'ı) û ku ji çend hezar peyvîn Erebî, Farisi û Tirkî pêk hatiye. Tirkan ji aliyekev ev

gotine, ji aliyê din ve jî ji bo ku miletê Kurd perçê bikin safsatâk welê derxistine ku xwedê-giravî Zazakî ne lehceyeke Kurdi ye, lê hem kesen ku bi zazakî hem jî yêni ku bi Kurmançî diaxêvin perçeyek ji miletê Tirk in. Birêvebir û berpirsiyaren Tirk di van demen-dawiyê de, pişti ku hebûna miletê Kurd idî nayê înkarkirin piştgiriyeke dide hin kes û der û dorênu ku bi idia Kurdnebûna Zazayan radibin, idayen wiha teşvik dîkin û di bin re alikariya wan dîkin.

## Zazakî

Yêni ku di roja İroyin de idia Kurdnebûna Zazayan berpêşdîkin hînek ji wan jî ideologen nasyonalist ên Ermeniya ne. Evênu ku xwe bi xeyala Ermenistanek Mezin ve girtine, herêmén Bakur û Rojava yêni Kurdistanê jî li ser vê Ermenistana mezin dihesibînin. Lê ji ber ku dizanî nifusa Ermenî li van herêman nîne, Zazayan bi taybetî ji Zazayen Dêsimê yêni Elewi ji alî reh û rîcikê ve dixwazin Ermenî nîşan bidin û bi vê mexsedê jî dixwazin Zazakî ji lehcîn Kurdi dûr nîşan bidin û nêzi zimanê Ermenî bikin. Ev ji piştgiriya wan der û dorin dîkin ku Zazayan Kurd nabînin. Ya gelek balkêş ew e ku piştgiriya kesen ku Tirk û Ermenî dîkin her eynî kes in.

Birêvebirênu Farisan û ideo-logen wan ên kîregirtî jî her muhawele kirine ku idia serbi-xwenebûna zimanê Kurdi bisser xin û bidin qebûlkirin ku Kurdi lehceyeke zimanê Farisiye.

Ji bili birêvebirêni siyasi û kes û dezgehîn wan ên xwendan mexseden taybetî, hin zimannas, gerok û misyonerên biyanî ji gelek caran ji ber mexseden siyasi yêni li gor berjewendiyen welatênu xwe û hin caran ji ji ber çavdêri lêko-lînen xwe yêni gelek sathî bi şâşcûnekî nivîsine ku Kurdi ne zimanekî serbixwe ye, lehceyeke ji Farisiya kevin û yan jî ya nuh. Yêni ku li ser zimanê Kurdi tehlîlen şaş ên qestî kiriye yan jî bi nezanîn şaş cûne, hejmaren kesen wiha jî yek du kesan ne zedetir in, lê ji alî lehceyeke zimanê Kurdi de hejmara kesen ku bir û baweriyen cuda cuda nivîsine û pêşkêş bê kirine, gelek zêde ye.

Li alî din divê em rastiyekî ji qebûl bikin ku herçî lêkolînen niyetçak û zanistî bi hejmara xwe gelek kêm bin jî ew bi xwe jî li ser zimanê Kurdi gihiştine bir û baweriyen ne wek hev. Ji

alî van de jî nezelaliyek heye.

Tevî hemû dijwarî, nezelalî û kîmasiyen lêkolînen ku li ser fonoloji, morfoloji û sintaksa zimanê Kurdi hatine kirin, nîşan dane ku zimanê Kurdi, zimanekî serbixwe yê xwedan tarixeke taybetî ya pêşveçûnê ye û vê rastiya han di warê zimannasî de xwe daye qebûlkirin.

Li gor vê, zimanê Kurdi zimanekî Hindu-Awrûpî ye, dikeve nav şaxê zimanê İranî û di vir de jî ji grûba İraniya Bakurê Rojava û Farisi û grûba İraniya başûrê rojava de ye.

Zimanê İranî ji alî avabûna rîzimanî ve dîbin çar bes: Kurdi di grûba İraniya Bakurê Rojava û Farisi û grûba İraniya başûrê rojava de ye.

Her wekî tê zanîn, zimannasan di encama lêkolînen li ser zimanê dînyayê de, li gor nêzikbûn an dûrbûna zimanân li ser esasî reh û rîcikê yê genelik aliye din ev ziman ji hev vegetandine, li gor hin ziman, hîn zimanen din nêzi hev dîtine û ew di malbatek zimên de hesibandine. Zimanen dînyayê dabeş dîbin ser van malbaten zimanan:

1- Malbata Zimanen Hindu-Ewrûpî

2- Malbata Zimanen Samî: Erebî, İbramî û Aqadî dikevin nav malbatê.

3- Malbata Zimanen Bantû: ji hin zimanen Afrika Başûr û ya navin pêk tê.

4- Malbata Zimanen Çinî: Ji zimanen Çinî û Tibetî pêk tê.

5- Malbata Zimanen Ural-Altayî: Di vê malbatê de zimanen Fînî, Macarî, Estonî, Uygurî, Samuyetî, Tirkî, Moxolî û Mançûyî cihe xwe digrin.

Malbata zimanen Hindu-Ewrûpî ya ku Kurdi jî têde ye, bi navê Asya û Ewrûpa dibe du bes. Beşa Ewrûpa, bi navê zimanen Cermenî, yêni Romanî û yêni Slavî dibe sê şax.

Di şaxê zimanen Cermenî de Swêdî, norvecî, Danîmarkî û İslândî hene ku ev zimanen İskandînâvî ne. Pişte Flamanî, Almanî û İngilîzî jî di vî şaxî de ne.

Zimanen Romanî ji Portekîzî, İspanyolî, Fransızî, İtalî û Romanî pêk tê.

Di şaxê zimanen Slavî de jî, Rûsi, Ukraynî, Bulgarî, Sîrbî û Lehî (Poloni) hene.

Herweha, Yunanî, Arnavutî (Albanî) Lîtwani, Keltî û Baskî ji dikevin nav besê Ewrûpa yê Malbata Zimanen Hindu-Ewrûpî.

Di besê Asyayı yê malbata zimanen Hindu-Ewrûpî de jî zimanen Hindu-İranî cihe digrin. Ew jî dabeş dibe li ser esa-sê zimanen Hindu û yêni İranî.

Şaxê Hindu, ji Sanskritî, Sindî, Urduyî, Hindiya İroyin, Biharayî, Bengalî, Marasî, Küçûrayî, Pencabî û Senegalî

## ● Mûrad Ciwan\*

pêk tê.

Di şaxê zimanen İranî de jî Farisiya Kevin (ji wê jî Farisiya Navin yan Pehlewî, ji Farisiya Navin, ji Farisiya Nuh), Avestayî, Sogdî, Belûci, Peştûyi, Osetî û Kurdi hene.

Zimanen İranî ji alî avabûna rîzimanî ve dîbin çar bes: Kurdi di grûba İraniya Bakurê Rojava û Farisi û grûba İraniya başûrê rojava de ye.

Zimanen dînyayê ji alî avabûna xwe ve jî di bin sê bes.

1- Zimanen Yekkîteyi: Zimanen Çinî û Tibetî ji vê grûbê ne.

2- Zimanen düvgir: Zimanen Tirkî, Fînî û Macarî di vê grûbê de ne.

3- Zimanen tewangbar: Zimanen Hindu-Ewrûpî û yêni Samî di vê grûbê de ne. Li gor vê dabeşkîrinê, zimanê Kurdi dikeve grûba zimanen tewangbar.

## Belavbûna Zimanen Kurdi ya Coxraffî

Li ser herêma coxraffî ya ku Kurd li ser dijîn, Mîrê Bedlisî, dîroknasî bi nav û deng ê Kurd Şerefhan, di Şerefname ya xwe de wiha dibêje:

"Hudûden welatê Kurdan, ji peravê Derya Hurmuz (Delavê Basra M.E.B.) ya ku ji okyanûsê vediqete dest pê dike, li ser xetek rast ji wê derê heta dûmahîka welayetên Meletiyê û Meraşê dike. Bi vî awayî aliye bakurê vê xetê Fars, Iraqa Acem, Azerbaycan, Ermenistana Piçük û ya Mezin pêk tîne. Li başûrê ve xetê ji Iraqa Erebî, Musil û Diyarbekir heye. Tevi vê jî gelek xelq û qebilîn ji nesla van insanan, ji rojhîlat heta rojava li gelek we-latân belav bûne." (1)

Roja iro, Kurdi li Asya Piçük, li erdê navbera Anadolu-yê, Kafkasyayê, Faris û Ereban tê axaftin. Li rojava Tirkî, li bakur Ermenî, li bakurerojhîlat Azerî, li rojhîlat Farisi û li başûr Erebî dibe cîranê vî zimanî. Axa Kurdistanê iro hatiye perçekirin û ketiye nav hidûden İranê, İraqê, Sûriyê û Tirkîyê. Li gorî vê, rojava û başûrê rojavayê İranê, seranserî bakur û rojhîlatê bakurê İraqê, bakurê Sûriyê û rojhîlat û başûrê rojhîlat Tirkîyê, welatê eslin ê zimanen Kurdi ye. Civakên Kurdiyê her wiha li Ermenistanê, Turkmenistanê, Pakistanê (Belûcistanâ Pakistanê) Afganistanê, Hindistanê û Lubnanê hene. Li paytext û bajarêne weki Horasanê, Tâرانê, Bexdadê, Şamê, Ankarê, İstenbolê, Konyayê û İzmîre ji

nifûseka kesif a Kurdiyê heye. Tarixa bicîhbûna Kurdan a li van welat û bajaran ji alî hin Kurdan ve gelek kevin e, dike bi sedsalan berî niha û ji alî hin Kurdan ve jî dikeve nav sedsalan de ya nuha, bi taybeti ji van deyan hatine sîrgûn-kirin, yan jî ji ber zilm û zorê ji mecbûrî barkirine. Bi vê mah-nê, li welatên Ewrûpa, li Amerikayê, li Awustiralyayê ji li ser hev nîv milyon Kurdi hene.

Heke em bixwazin hidûde welatê eslin ê zimanen Kurdi destnîşan bikin, em dikanin tabloya jîrîn diyar bikin:

Li bakur, li Ermenistanê ji Leninekanê dest pê dike ber bi rojava de bajarê Qersê, Erzurumê, Erzincanê, rexê rojhîlat bajarê Siwasê û qeza Sarizê ya Qeyseriyê digre nav xwe. Pişti re dikeşê Meraşê, Qirixana Hatayê jî digre, di wir re ji hidûde Sûriyê û Turkiyê dibuhure dike herêma Efrînê (Çiyayê Kurmênc) ya li Bakurê Helebê. Afrînê digre nav xwe û ber bi rojhîlat dike; Kebaniyê (Aynd Ereb), Serê Kaniyê (Rasul Ayn), Dirbêsiyê, Amûdê û Qamişliyê digre. Pişti ku hemû herêma Cizîrê ya li Sûriyê girt ber xwe ber bi başûr de rex bi rexê Dicle dadikeve Musilê, çiyayê Sincêr, quntarê başûr ên rîzeçiyayê Hemîrin digre nav xwe, li hundurê İraqê li başûr digihîje herêma Tikritê. Li wir Mendeliyê, û çiyayê Pişkîw digre, dikeve hidûde İranê, li wir digihîje başûrê Loristanê ku ji Pişkîw, Pêşkîw, Balagrêwe, Bextiyar, Kahgehî û Momesanî pêk tê.

Ji bakur ber bi rojhîlat de, gava ber bi başûr dadikeve, hidûden zimanen Kurdi, peravê rojhîlat ê çemê Erez, li İranê Makû û Xoyê û peravên rojava û başûrê Gola Urmiyê, çiyayê Sehend ê ku dikeve bakurê Merexe digre nav xwe. Ji wê derê bi zîzkâr dike û Ahmedawa, Mesîrabad, Bicar (bajarê Kurdi yê paşin yê li rojhîlat bakur) digre ber xwe, ji gund û qesebîn Esedawayê derbas dibe ku ev bajar dikeve rojavayê Hemedanê, pişti re dirêj dibe heta Karêzê, Alî Çadderê û Şar Kurdê ku ev bajar li rojavayê İsfahanê ye. Ji wir ber bi başûr de dadikeve û digihîje bajarêne Kûzeyrûn û Hesarê (2)

(\*) Ev nîvî ji kitîba Mûrad Ciwan a bi navê "Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi -Kurmancî Lehçesi- (Jîna Nû yayınları, 1992, İsviçre) (Rêzimana Kurdi bi Şirovîkirina Tirkî -Lehçî Kurmancî-) ji Tirkî hatiye wergerandin. Armanc

(1) Şerefhan, Şerefname, Ha-sat yayınları, 3. baskı 1990 İstanbul, M. emin bozarslan ji Erebî wergerandiye Tirkî.

(2) Fuad Heme Xurşîd, Zimanen Kurdi, Dabeşbûnî Diyalaktikanî, çapxaneyî Afaq Al arabî, Bexdat, 1985, s. 55.

(Dom dike)

Tehsin Taha:

# "Xelk ji stranê ku zû têjiberkirin hez dikin"

Awazê dengbêjê Radyoya Baxdayê Tehsin Taha hîn di 10 saliya min de tesirek mezin li min kiribû. Wexta em li gund bûn, bavê min her sibê û êvaran Radyoya Baxdayê ya Kurdi guhdar dikir, wextê dor dihate stran û kilaman min û birayê xwe dev ji listikê berdida û em jî dihatin li ba bavê xwe rûdiniştin û me li stranan guhdarî dikir. Ez tiryakiyê Tehsin Taha bûm. Ez dikarim bêjîm ku di saya wan stranan de ez bûm welatparêzekî Kurd.

Belkî ji ber wê be jî, wexta ez di Havîna 92'an de çûm Kurdistanâ azad, karê min ê yekem ew bû ku ez Tehsin Taha bibinim û ji bo Armancê reportajekê pê re bikim. Ez çûm Hêwlîrê mala wî û li wê pê re peyivîm. Piştî xêrhatînê sohbeta me qulupî ser muzik û hunermediyê.

Zaniyariya Tehsin Taha li ser hunermend û hunermediyê zelal bû. Bi gotinê besit û maqûl muzikvan û stranbêj tarîf dikirin, digot; "Berî her tişti divê Muziknas an stranbêj pêşrewê milletê xwe be, divê hinek tiştan ji kesen din pirtir zanibe, di mustewa karê xwe de be. Dikandar hene, necar hene, şofêr hene, mamoste û hwd. Divê her yek ji vanan karê xwe bike da ku mirov karibe wan bi nav bike. Lî heke fenan, hunermend an muzikvan divê bizav bike û bixwîne. La-zim e li pey karê xwe biçe. Eger hat û ev kesen han gihaşte dereceyeke bilind, li ser meslehan, di Televizyonê de, li ser warê sînemayî dema ku pirsayar ji wan hate kîrin divê karibe bersiva wan bide, bêdeng nemîne, divê karibe bersiva wan bide di mustewak bilind de. Yanî divê hunermend bi zanyarı li dû karê xwe biçe û berhemên zanyarı biafirine."

## M. Arif ketiye dilê min

Berê ji min bihîstibû ku kîfa Tehsin Taha ji wan dengbêjîn ku stran û kilamîn Kurdi dîkin, Tirkî, Erebî û Farisi nedihat. Ji bo İbrahim Tatlıses digot "İbrahim Tatlıses, kurê bavê, de hilma du strana bo milletê Kurd ji bêje". Ji dîlva ku tu bêjî "ayağında kondura", bêje "qundura nigê keçikê", li ser çiyayeki Kurdistanê bêje, li ser gola Wanê bêje. Hey malîmirat!" Ü Taha wiha dom dikir; "Ezîz Şeroxekî heye disa ji Kurdistanâ Iranê, dengekî li ser e tu yê



*Tehsin Taha* "Dikandar hene, necar henin, şofêr henin, mamoste û hwd. Divê her yek ji vanan karê xwe bike da ku mirov karibe wan bi nav bike. Lî heke fenan, hunermend an muzikvan divê bizav bike û bixwîne. (Foto: Armanc)

bêjî pîpîka zîrnê ye. Hesen Zirek rehmet lî be. Mehmed Arif ketiye dilê min ci caran jê dernakeve. Stranbêj heye ku bi tenê bi stranekê meşhûr bûye û alem jê hes dike. Ez neşem hemû navan bêjîm, li Kurdistanâ Iraqlî Tariq Refîk rehmet lî be, ew jî gelek dengxwêş bû."

Tehsin Taha wexta behsa Şivan Perwer dikir, digot ew ne tenê hunermendekî Kurdistanâ ye, herwisa ew hunermediyê cîhanê ye.

Tehsin Taha úd û keman lêdixist. Wî ne tenê di warê muzikê de, her wisa li ser şanogeriyê ji xebat kîriye. Wî digot, "sinetê min ê esasî şanogerî ye" û behsa operayê xwe yên Hêwlîrê ku çêkirine ji dikir: "Piştî ku ez hatime Hewlîrê, sala 1977-78 min hindek opera derxistin. Opera yekê Destana Şoreşê bû. Operata duyê Rûbarî Jîyanîm. Herdukan xela leta yekê wergirtin. Min hindek tişten piçûk ji çêkirine, weki sikeçan, ew jî min dan xelkê, birin cihê dîn."

## "Bêrîvanê Malwêranê"

Nizanim fikra we xwendevanan ci ye, lê, bi a min Tehsin Taha bi strana "Bêrîvanê Malwêranê" hatiye nas kîrin. Wî digot besta wê stranê ji aliye Bedirxan Sindî ve hatiye nîvisin. Ne tenê ev stran, herwiha piranya stranê wî ji aliye Bedirxan Sindî ve hatiye nîvisandin. Ji bîlî B. Sindî, Feysel Mustafa,

Rêkêş Amêdî, Mueyed Teyib ji hinek şîr dane wî. Li ser stranê xwe û heskirina stran jî digot ku: "Ez bi xwe jîma-ra stranan bizebit neşem bêjîm. Lî ewen ku li radyoya Kurdi li Bexdayê hatine gotin, li dora 100 stranî ne. Weki din evêni li derive û li kasetan û yên ku min hêjta nekirine kaset ji hene. Hindek hene dibêjin min hinde kaset çêkirine, min hinde stran gotine, çar sed an hezar stranê min hene. Ez bi xwe dibêjin ev tişt bihayê xwe nine. Ya gîring bihayê stranê ye. Ez bi xwe carna di salekêda deh donzdeh stranan çedikim, tu mîze dikî ji van yek an du, mîlet ji wan hez dike. Reng e ji sitranê din hez nekin. Tiştê ez dizanîm milletê me hez ji stranê zehmet nake. Millet hez ji stranen sivik, yên ku zû ji ber dibe, dikin. Meselen min gelek stran gotine, yek ji wan stranê min bi navê Derew e, ev sitran hem naveroka wê û hem ji awazê wê zehmet û dewlemend e ku ji çar kupriyên renge reng pêk tê. Lî mixabin nekete mejkê milletê me. Belê bo nimûne sitrana Behdinan ku besta wê ya bavê min e, wek bombekê teqîya."

Tehsin Taha digot hezkirina strana wek hezkirina zarakan e û dom dikir: "Ez wesa dibînim heke hunermend dest bi stranekê dike, dibêje wê gavê ew stran bo wî hunermendî gelek xweş e. Heke straneka din çêkir ew ji ya din xweştir e. Heke yeka din çêkir,

ew jî ji ya din xweştir e. Weki çawa Xwedê kurekî dide te, gelek xweştivî ye, paşê keçek çedîbe her çend keç e jî, lê ji kur ezîzîtir e li ber dilê mirov. Paşê heke kurekî din çêbe ew jî ji keçê şerîntir e. Sitran jî li cem min weha ne. Herçend hindek stran hene bi min ve girêdayî ne, mana wê li ser min e, ji ber ku ez ji hunermend im, ez ji mirov im, min ji his û şîur heye û her wesa civakî ye jî lê mîlet jê hez nake. Ez dixwazîm li vir nimûneyekê bînim. Meselen strana "Derew e" min gelek divê ji ber ku babet li ser min e, lê mîlet jê hez nake. Meselen strana "Behdinan" pirtir jê tê hez kîrin. Her tim millet, gel hakim e. Çawa bîryar bide weki wî ye."

Ew, di axaftina xwe de pir caran li ser pêşketina muzika Kurdi disekeñî û digot; "Muzika Kurdi gelek pêşkeftî ye, heke em herçar birayê Kurd bige-hînin hev. Mebesta min her çar parçen Kurdistanâ ye. Wê ga-vê em dikarin bêjîn İbrahim Tatlıses ka were ev malê te û bavê te nebû, ev malê me ye. Em dikarin bêjîn ewê Iranî ewê ku awazên me dizine, kîrine malê xwe. Mebesta min muzika Kurdi bi xizîna xwe gelek dewlemend e. Bes em carna pengavê mezin davêjin û car-carna ji di cihê xwe de dilivin. Berî nûke tipa Suleymaniye hînek karêne gelek baş pêk anîn. Koysenceq berî çend salan berhemên baş afîrandin. Paşê Dilşad hat ku firqa Dihokê da-

mezirand û berhemên gelek ciwan çêkirin ku ev berhem ji bo mustewa Kurdan gelek bilind bûn. Ew gihaşte merhela harmonî ku di hunerê muzikê da pileya herî bilind e.

## Dizê Muzikê

Tehsin Taha digot ku ji ber radyo û televiziyyona me tuneye dewletên cîran yên metîn-gehkar muzika me ji me dizine û kirine malen xwe. Çunku T. Taha; digot "berî me ci televizyon û radyo nebûn li Kurdistanâ mezin ku ev şûl bêne hesibandin li ser milletê Kurd û bêne parastin, da ku bikevine xezîna muzika Kurdi. Ya din li mentîqa silal (jor) ya ku em dibêjîn Kurdistanâ mak, dayika Kurdistanâ ye ku iro di bin darê hukmeta Tirk da ye. Evê mala me xira kîriye çunko gelek tişt birine bo Tirkân, dizine. Nûke gelek stran hene ku bi Tirkî têne gotin, lê di heqîqetê de muzika Kurdi ye, folklora Kurdi ye, lê hatiye damxekirin li ser hesabê Tirkân. Ev stranê han berî 50-70 salî millet li şevbêrkan, li dexildirûnan, li dawetan, li savar kutanan digotin. Hingê me kes nebûn, me imkan nebûn ku van berhemên han têxin arşîvan ji bo parastinê, bo milletê Kurd. Em bêne nêzîk bo Suriyê, here berî xwe bide Qamişlî, Dêre-zorê hindek stran hene "Heye elesela" bi Erebî dibêjin, lê bi eslê xwe Kurdi ye."

Di raya gişti ya Kurdan de têzanîn ku T. Taha li li gel rejima Baasê karê xwe yên hunerî meşandiye, gelek Kurd ev mese-lê meraq kîriye. Me jê re got gelo, hûn çawa dikanin karwanê xwe yên hunerî di gel rejima BAAS bi rê ve bibin? Ji me re got ku; "Bi rastî karwanekî gelek zehmet bû, karwanekî sext û dijwar bû, ji ber ku diviyan mirov bişyana xizmeta milletê xwe bikrana ci bi sitranê ci bi şêweyekî din. Meselen operetên ku min çedikirin heta hedekê, heta radeyekê min dikarî ku xizmeta milletê xwe bikim. Ü ci bi sitranê ji eger tu peyvîn sitranê min yên wê gavê ji berî xwe bidîye miilmileka (musabeqe) mezin min li gel hukmeta Baas kîriye. Belêne ku wesa ji meseleka Kurdi heye, ne ya kevin ji, lê ji wextê şoreşê heta niha tê gotin ku mirov divê têlê nebîzîne, yanî têl nepirçe heke te têl nepirçand wê gavê tu dikarî gelek tiştan pêk bînî. Bo nimûne tu yê bo ci behsa Sedam Huseyn

bikî di nav sitranê xwe da. Tu dikarî nefsa wî bêji bi rengeki din, lê şert nîne tu navê wî bîni û bêji hukmeta Baas faşîste, hosaye, hosaye û tu di nav hukmetê da dijî. Mana wê eve divê roja paşin tu nemînî, yanji divê ez jî piçûkên xwe elelken xwe hilgirim bidme bin hingîlen xwe birevim wekî biraderen din, an jî bikaribim xwe li vêre ragirim û karwanê xwe birêve bibim. Ewan wesa bi bêjatî gundêne me kavil û wêran kirin, wesa bi bênamîsi hatne me, em jî lazime bi siyaset biçne wan, ne wesa bi req û teq bin li beranberi wan. Meselen gelek sitranê min bigre ji distarê, distar meniya wê şoreş e, şoreşa Kurdistanê ye. Ez dê bo ci bêjim me Kurdan weha kiriye, weha kiriye û em dê biçin weha li hukmeta İraqê bikin. Ez dê sitranê li ser rûbarekî Kurdan, li ser çiyayekî Kurdan bêjim. Ez dê rubarî bikem tiştekî Kurdan."

Tehsin Taha jî wek her hûnermendeki Kurd dixwest bê Ewrûpayê ji Kurdan re konseran bide û beşdarî şevê Newrazan be, lê digot, nuha îmkan tuneye, piştî ku parlama. Kurdi hate avakirin hindek bîraderan xwestin ku ez biçim derve konserekê bidim. Lê heta niha parlaman ci îmkanêne weha nînin ku karibe min firê bike derve. Û iro problemen me yên mîletî gelek ferzîrin ku bêne çareserkirin jî dîlva ku yekî wek T. Tehayî firê bikin derve. Niha alem gelek bertengave ku nikare xwe xwedan bike, niha wijdanê min qebûl nake ku ez derkevîm derve ji ber ku ne tiştekî durist e. Alem jî vê niheqiyê qebûl nake, niha ne dema vê kêtî ye ku milletê me ji birçina dimre û ez derkevîm bo kêtî. Bo min geleki xwestir e ku ez li gundekî Kurdistanê yê wêrankirî ahengekê çekim. Iro parlaman hatiye avakirin û me îman pê heye ku dê problemen xwe çareser bike. Divê em hemû Kurd ci li welat ci li derve piştgiriya vî karê pîroz bikin da ku em bi ser kevin, eger em bi ser nekevin zîr ya me hemû Kurdan e.

#### Jiyana Tehsin Taha

Dawîya axaftina xwe de me pirsek klasik ji Tehsin Taha kir ku ew hinek bahsa jiyana xwe bike, wek her Kurdeki wî jî dûrû dirêj bahsa jiyana xwe kir û bi vî hawî xwe teqdîmkir:

"Ez, Tehsin Taha Mihemed Selîm sala 1941'ê li nehya Bêgo an ku dibêjine Nêrwe ji dayik bûm. Ji bavekî feqîr. Bavê min hingê katibê nahiyê bû li wêrê. Hingê 12 nifûs di hustuyê bavê min de bû. Ji ber ku bavê min karmendê dewletê bû, em li gelek cihan geriyân. Piştî ku em çûn Mangêjkê, em heft sal û nîvan jî li wir man. Min pêngava xwe ya yekî ya hunerî li wêrê avêt. Paşê em

çûn Amediyê, heta sala 1960 em li Amediyê bûn. Piştî em ji Amediyê çûn Zaxoyê. Her wê salê ez li Akademiya hunerî hatim qebulkirin. Li sala 1964 -65 Piştî ku min xwendina xwe dûmâhik a-nî ez neqlî Mexmûr bûm. Pênc salan li wir mam. Paşê hatim Hewlîrê û heta niha ez li Hewlîrê, li xwendin geha di kar û barê perwerdeyi de karmend im.

Jiyana min ya hunerî, hêjta temenê min 7 salî bû; hingê sinema dihatin Mangêjkê û millet mikrofon dida destê me û me teqlîda sitranbêjîn hêjta Mehmed Arif û Hesen Cizrawî dikir, me sitranê wan digotin. Û M. Arif, rehmeta Xwedê li ser wî be, li gel Arif Reşîdî di gel Arif Sawyeri, Eziz Ezra, Hesen Cizrawî, ew hemû dihatin nik me. Ev e bû yênu ku ez bi rîve birim yan bûne siifek (eger) bo min ku ez dest bavêjîme stranan. Rojekê baş tê bîra min Mihemed Arif digel babê min gotine min "ka bo me sitranekê bêjî". Min jî sitrana "Were Hêyo" got. M. Arif gote bavê min "ev kurê te dê sitranbêjekî pir baş jê derkevit" Ev gotina wî hêjta di mîjekî mînda ye.

Min dersên muzikê li cem hindek hevalan dît, yek jê bi navê Hemîd Smaîl Koyî ku mirovekî pêşverû bû. Min dersên xwe yêngîn hingê û destpêkê li cem wî wergirtin. Paşê ku ez piçekî fîr bûm, édi min bi xwe dest havête sitran û meqaman. Her wê salê sala 1960 sitrana yekê ya beste û meqam ya "Derdo û Dilo Ez Bîmrim" di Radyoya Bexda besê Kurdi de tomar kir. Sala 1963 Lafawa Baasiya bi ser me de hate xwarê. Em nikarin bêjîn şoreş jî ber ku şoreşka rûreş bû. Ez hingê hatime girtin. Me karwanê xwe bi cih nehêla. Hingê me di hefsê de, her heftî meslehiyek çedîkir. Hingê min ji qazankan 10 ûd çekirin. Heta axîrîn úda min jî li Zaxo mabû. Li Zaxo mudurê hefsê udek jî min girt, yek jî min di gel xwe ïna gava ku ez hatime berdan. Dema ku ez di hefsê de bûm, kesen girtî pere didane qardiyana daku ez biçim qawîşen din ku hefla bo wan çê bikim.

Min bo televizyonê ji cara yekî sitrana bi navê "Behdîna" sala 1970 çekir. Neh salan ez ji radyoyê hatime derbederkirin. Piştî ku min sitrana "Derdo û Dilo Ez Bîmrim", "Deng Porê" û sitrana li ser 14 Temuzê got, ew jî du caran lê dan piştî hingê berze bûn û heta niha li arşivan jî nînin, em nîzanîn ka ci lê hatine. Hingê navbera min û mudirê Televizyonê nexwes bû, ez mecbûr mam ku min sitranê xwe tenê li ser şeritan digot, tevî ku şerit gelek kêm bûn. Min heta sala 1970 berhemên xwe hemî kom kirin û paşê careka din dest pê kir û belav kirin."

Hecî Kardoxî

#### RONO Û SIRUDÊN BÊRÎKIRINÊ

# Ji dayîkbûna mirinê

Ahmed Huseynî

Yara min... Karwanê bêdengiya dijwar, tenhatî û hîvîn xemgîn, asoya bê reng û bajarê sermestiyê ku xwe bi kefeneke berfini rapêçaye, li çeregeha axîna min nimêja xatirxwestinê werdigerinin zimanê koçbarî û oxira tal.. Ez di nav lepêñ xewna vegerê de wek rûpeleke sade, li tev bîna nameyên derengmayî de, diqermicim. Laşê min panava govendê ye, dem û kat-jimêr di xwêdana min de digevizin û çirén şikesti û qonaxa lerzê hogiri dergûşa bîraninan bûne. Payîz bû. Ji xwe dar li Amûdê hindik in û payîz em bêdili xwe berî didin dibistana ji kelpîcan. Bi cilêñ veçriyayî, bi gavê sist, em qunaxê ji mal ta dibistanê dibirrin. Her payîz em li ser havîna xwe digiryan. Havîna ku em di himbêza wê de dîn dibûn, havîna ku ta nuha, me navê xwe li ser mijankêñ wê ji bir kîrine. Û "Amûdê" xemgîn e, husa diyar e, husa diji, husa em ji şir vekirin, husa em ji xewa li bin dara tuyê rakirin, em li ber babisojan çûn, em bûn xweli û em man bê war û şûn.

"Awirê dawîn davêjim dora xwe. Ez dê ji kê ra bêjim bi xatirê te? Û ji ci re?

Ji ciyan re? Ji deryan re? Ji darmêwa mişt goşî a ku hilperikiye pencereya min re? Ji çakî yan jî ji gunehkariye re? Ji esmane tamxwes re? Bêçare ye, bêçare ye. Wê tev bi min re dakevin gorê." (Nikos Kazanzaki).

Kul in yara min.. di xwe lidanka şevê de ber bi rona-hiya kavilan de diherikin. Şitla keservedanê, di pixêra şewatê de, di axa axînê de xwe li ba dike, perrên birînê, kulilkên evinê û baxên hevdinê xwe nasipêrin bagera surgûnê, goristan tê li nik taristanê rûdîne, stêrk pîr dibin, sibehêñ bintengiyê jîr dibin, ewrêñ windayî esmane xwe dibînin, çavêñ westyayî bê ken dimînin û biyanîyên zuhabûyi gurizên gulan ji bo yi sîbera miryan dişin... Rono!... Paşîya, em li dora dayika xwe kom dibûn, wê gavê me nîzanibû ku zarokêñ cihana şaristanîyê seet di 8'an de xew dikin, me dest bi pîrsan dikir, bi hesteki zarokane û lerzok, me li çiyetiya tiştan dipirsî.. Zivistan e û bayê kur ji nav pencen Torosê rîzgar bûye, bi hêrs xwe li bin guhê penceran dixe, dergehêñ textinî yên herifi car caran diqirçin, kûçi-

kên beradayî bajarê me bi 'ewte 'ewte dagir kîrine. Ü dayika dilovan dest bi çirokan dike, Şengê û Pengê, Taska Zêra, Kêz Xatûnê û ji destanan berê xwe dide rojîn xwe yêñ bûri, em jî li gel wê diçün qonaxa piroz, gav bi gav em nêzi bênderen şiniyan û tirajidya giranbuha dibûn. Rabirdûyeke dûr bû lê anuha di hisê min de tezetur e.

Carekê min jê pîrsî:  
-Ma tê bîra te kengî ez çebûm?

-Sedised nayê bîra min, lê şeveke pir tarî bû, sar û baran bû.

-Erê yadê ma ne şevêni bi baran tev reş û sar in.  
Destê xwe di ser serê min re dibir û tanî û digot:

-Ma tu dixwazi ku ez bêjim şeveke sîpi bû, kurê min?

-Dayê??!!  
Di nîvê gîrî de min keysa xwe  
li bîraninan xweş dikir..  
Min hemû qoçanen xewna xwe  
pêşkêsi pênuşa çavres dikir..

Ji dayîkbûna mirina te-wankar  
li kîfereta canê xwe  
dabeş dikir... □

## "Bazirganiya însanan"

Robîn M.

Ambargoya cîhanê li dijî Iraqê û ya Iraqê ji li dijî Kurdistana Başûr Kurdan mecbûr dike ku welatê xwe yê rîzgarkirî terk bikin û bêñ Ewrûpayê îltica bikin.

Herçiqas dewletên Ewrûpayê deriyê xwe ji penaberan re girtine jî, lê hin rîyên wisa peyde bûne ku ew dewlet ne mumkun e ji heqê wan derkevin.

Piştî belavbûna sistema Sovyetê, mafiyayekî ecêb li Rûsyayê û welatên ku berê Yekîtiya Sovyetan teşkîl dikirin, peyda bûye. Ev mafîya wisa deng daye ku gelek Kurd û kesen din ku ji Rojhilata Navîn mecbûr dibin, îlticayê Ewrûpayê bikin rîya Rûsyayê tercîh dikir. Ji ber ku Rûsyâ bi alî cografî nêzîkê welatên wan e û him jî li gor deweletên cîran jîyan li wê erzantir e.

Di meha İlona 1992'an de 16 Kurd, di meha Çiriya Pêşîn de 39 Kurd û 20'ê Çileya Paşîn de jî 391 Kurd bi kîşîyan ji aliye vê mafiyayê têñ Ewrûpayê. Grûba ku vê meha dawiyê (Çileya Paşîn) bi vê rîyê hatin, ji bo Swêdiyan gelek balkêş bû. Balkêş ew bû ku di kîşîyek piçûk de; 4 kes di ciyekî 1 m<sup>2</sup> de bi ci bûne û ji Rigayê (paytextê Letonyayê) heta giravekê Swêdê(Gotlandê) "rêwitiya" wan 7 rojan ajotiye.(Normal rî 8-9 seet e)

Wexta ev multeci gihaştin Swêdê geleke perişan bûn û hinek ji wan rakirin nexweşxanan.

Lê li gor hin agahdariyan ji wan tenê 50 kes Kurd in. Yêñ din jî Şii Ereb û Faris in. Lê gelekên wan Ji bo ku ji Swêdê musade bistînîn xwe wek Kurd nişan didin.

Li gor Peymana Cenewrê (1951) Swêd û welatên din yêñ Ewrûpayê mecbûr in ku keseñ ji ber sebebên siyasi û dîn û hwd. welatên xwe terk dikin, qebûl bikin. Lê îcar wisa bûye ku gelek kes jî ne ku ji ber sucen siyasi û dînî, lê ji ber feqîriyê têñ Ewrûpayê û dewletên Ewrûpayê mecbûr dibin tedbiran bistînîn. Yek ji van tedbiran ew e ku wasitên ku bi qaçaxî "multeciya" tînin, wan ceza dikin. Kaptan û muretebatêñ ku multeci ji Rûsyayê anîn meqamên Swêdiyan ji du mehan heta car mehan cezayê hefsê da wan.

Li gor programeke televizyonâ Swêdê mafîya Rûsan serê her merivekî 2000 -3000 dolar pere distîne.

Tê gotin ku nuha li Rûsyayê û li welatên Baltikê nêzî 4 hezar Kurd(piranî Kurden Başûr) di şertekên gelek xerab de dijin û piraniya wan ji bo hatina Ewrûpayê li riyeke di gerin ku bêñ welatên Ewrûpayê.

# Kurtejiyana Min

● Mahmûd Lewendî

*Di gelek rojname û kovaran de, li ser bergê paşî yê hin kitêban, bi navê "jiyana wî", "jiyana min" an ji "kurtejiyana min" niviskarêne me behsa jiyana xwe dikin.*

*Niviskarêne xelkê wexta ku behsa "kurtejiyana" xwe dikin tenê bi kurtî behsa niviskari û berhemên xwe dikin. Lê yên me? Yen me ji zarotiya xwe dest pê dikin, behsa bapir û kalikê xwe, behsa rîwitiyên xwe yên bo hin bajaran, behsa tarixa Kurdan dikin, behsa serê Şêx Seid, serihildana Dêrsimê, şerê İran û Iraqê, şerê Lubnanê û hîn gelek tiştên din dikin. Yanê nivis ji kurtejiyanê derdikeve dibe tişteki din; dibe "dirêjejiyan".*

*İcar ji ber wê yekê ez fikirim min got eger bi vî awayî be ezê ji "kurtejiyana" xwe binivîsim. Di vê "kurtejiyana" min de tu derew û mubalekeyek tuneye. Min ji bi rastî "kurtejiyana" xwe nivisiye, lê bi awayê wan hevalan. Belê ev e kurtejiyana min:*

xwestiye berî ku here şer ji kalikê min re nanê şikeva lêxe. Rabûye hevir kirîye, agir daye, sêla xwe avetiye ser agir û nan lêxistîye. Nanê pêşî yê germ li gel rûnê nivîşk daye ber kalikê min. Kalikê min di gepa pêşî de bi ser pîrika min de qîjîyaye û gotiye: "Nanê te bê xwê ye!". Pîrika min a Etê ji gotiye: "Na!". Li servê yekê yek ji wî û yek ji wê, pêşî bi devkî, paşê bi hundukî û gurmikî û pişt re jî pihînkî li hev xistine. Kalikê min serê pîrika min şikandîye. Pîrika min bi wê xuyuna serê xwe berbi mala birayên xwe reviyaye. Kalikê min jî daye dû wê. Birayên pîrika min derketine rasta gund, xwe li kalikê min rakişandine, xwesrine li kalikê min xin. Lê birayên kalikê min jî xwe bi kalikê min re gihadine. Pêşî bi ço û daran, paşê piçekî ji hev dûr ketine, içar bi keviran û di dûre jî bi tifingên "çapılı" û "almanî" repandine hev. Sê birayên pîrika min û du birayên kalikê min û çar gundiyyênu ku ketine navberê di vî şerî de birîndar bûne. Berbi êvarê şer rawestiyaye. Herkesi birîndarên xwe birine malê, birînen wan kewandine û pêçane. Paşê nêzî nivê şevê risipî û axalerên eşirê li hev civîyane.

Dilê min liyan e, dilê min liyan e (wî ev ci bû, bibexşînin min got qey ez sitrana dibê-jim).

**B** elê, fikirine, ponijîne. Birine anîne, ci bikin, ci nekin, bi ci awayî herdu serîyan li hev binin. Rîsipî û axaleran bi herdu alîyan re qise kirine. Herdu alîyan birine, anîne, pîvane, wezinandine, paşê bi raya gişan çar ga û du mange û sé mi û du beran û bizin û karikek û du mirîşk û 24 hêk li kalikê min wek ceza birîne. Kalikê min derhalkê ban bavê min kiriye. Bavê min yekser çûye cezayê kalikê min anîye daye mala bavanên pîrika min. Kalikê min jî bi çeplê pîrika min gitîye anîye malê. Wê şevê bi hev re deng nekirine. Roja din jî bi hev re deng nekirine. Ji ber wê yekê kalikê min jî bi bîra wî çûye ku biçe têkeve şerê Şêx Se'îd. Hetta van salân dawîn jî kalikê min her tim liberketina xwe dida diyarkirin û bi ser pîrika min de diqijiya.

Neyse, em dîsa vegeerin ser meselê, belê li Diyarbekir em li taxa mala Cemîl Paşayê bapîrê Qedî û Ekrem Cemîl Paşa yên ku demekê li Sûriyê di 1932'

an de li gel rehmetiyê Celadet û Kamûran Bedirxan kovara Hawar derdixistin, diman. Gerçi pişt re kovarê Ronahî û Roja Nû ji derxistin, lê ji ber ku ez behsa "kurtejiyana" xwe dikim, ezê nuha nekevîm nav wan meselan.

Belê, em li ku mabûn! Temam nuha hat bîra min; kurtejiyan.

Erê "kurtejiyan" e, lê welê xuya ye, ê min jî wek yê wan hevalan piçekî dirêj bû. İcar di rojnamê de cih ji tuneye ku vê kurtejiyana xwe piçekî din dirêj bikim. Ji xwe ez texmîn nakim ku redaksîyon jî bîhêle. Ji ber wê yekê ezê behsa hin devreyen jiyana xwe nekim, ji xwe ne pêwîst e ji ku ez rabim bibêjim min mektebêne seratayî(ilkoqil), navendî(orteoqil) û lîse û unîversite li Diyarbekirê xwendine. Her weha ez ê behsa dewra DDKD'yê ji nekim ku di 1977'an de me li Diyarbekirê ava kiribû. Ji xwe di 1980'yi de bi hatina Cûntayê re ew jî hat girtin û ji ruyê vê komelê de polîsan ez girtim, li Çarşiqereqoliya Diyarbekirê bi êzingan li min xistin, parsûyen min ên alîyê rastê hê jî ji ber wan lêdanen diêşin. Min gelek işkence dît, işkenceya ku min dît bila qet neyê-pardon bila were-serê dijiminê min. Eger hûn ji min bawer nakin, herin ji wê xanima ku li Xaça Sor kar dike bipirsin, ew bi êşa min dizane. Neyse, qet mepirsin yan na ezê jî bi navê "di işkencê de nîv saet" kitêbekê binivîsim.

Niviskarıya min hê ez şes salî bûm dest pê kir. Cara pêşîn min bi qelema reş li ser kaxeza sipî navê xwe nivîsi û mamoste ji min re got "aferîn!". A ji wê rojê de ye ez her dinivîsim. Ji mektûben eşqê û yê eskeran bigrin heta bi lotto û totayan ez dinivîsim.

Di destpêkê de meraqa min pir li ser helbestan bû. Lê bavê min û diya min nedîhiştin ku ez helbestan binivîsim. Her çendî xwendin û nivîsandina wan tune bû jî, lê daxwaz û meraqa wan her ew bû ku ez roman û çirokên pir dirêj binivîsim. Hela tew pîrika min, wê jî digot "binêre lawo, gerek tu romanên welê binivîsi ku ji yê Viktor Hugo jî baştir bin!".

Dîsa jî her wexta ku min fersend didit, min bi dîzi helbest jî dinivîsand. Lê min ji tîrsa dê û bavê xwe û bi taybetî ya pîrika xwe, helbesten xwe dikir ber doxîna xwe, di pîziya derpiyê xwe de vedîşartin. Rojekê dîsa min û zarokên kuçê me ji xwe re li derve dilîst, helbesten min jî di ber doxîna min a lastîki de bûn. Ü çîma lastîka doxîna min neqetiya! Wele ji fedîya ez reviyam malê, min şalê xwe guhert. Paşê lê varqîlîm ku ew helbesten min ên ku di pîziya doxîna min de bûn hemû ketine. Hema yekser ez reviyam

derve ciyê listikê, ez li helbesten xwe geriyam. Lê ci heyf ku bayê lêxistibû, hemû bi hewa de firyabûn, çübûn. Ji wê rojê de ye ew helbesten min ên ber doxîne ji min re bûne kul û derd, nayêñ bîra min jî ku çawa bûn, belkî min bikariba ji nû ve binivîsanda. Hema sernavên wan ji heba bes bû. Ger ew helbesten min ên ku ji pîziya doxîna min ketin û wenda bûn, nuha hebana, ez bawer im, di edebîyata Kurdi de rewşa helbestan wê nuha ne welê qels ba.

**D**i 1976'an de çar kitêbên min ji cîldci derketin. Ya pêşî li ser Fizyolojîyê bû, yê din ji li ser Botanik, Biyokimya û Mirobiyolojîyê bûn. Çiroka van kitêban ji weha ye: Me hê nuh dest bi van dersan kiribû, kitêbên çapkirî tunebûn. Ma mosten me wek teksîr nivîsen van dersan li me belav kîrin, me ji dibir ser cîldci hem cîld dikir û hem jî navê xwe bi herfîn zérîn an ji zîvin li ser wan dida nivîsandin. Belê bi vî awayî gelek kitêbên min derketin, lê nuha navê wan nayêñ bîra min.

Berhemên min ên çapnebûyi gelek in. Ji ferhengen Kurdi bigrin heta bi astrolojî û folklorolojîyê, ji 200'i zêdetir kitêbên min ên ji çapê re amadebûyi hene. Eger ez nav û sernavên wan rîz kim mumkun e deh rûpelên Armancê bigrin. Ji ber wê ez hewce nabînim binivîsim, lê eger rojekê fersendek din a weha têkeve destê min ez ê qala wan jî bikim.

Belê, pişti 1980'yi cûnta eskerî hat ser hukum, ez jî wek gelek Kurdên din ji mecbûrî ji welet derketim hatim Sûriyê. Wexta ku ez li Sûriyê bûm şerî İsrail û Ereban her berdewam bû. Paşê çûm Lubnanê, li wir ji her şer bû. Ji xwe her wê salê bû ku Ingilizan avetiibûn ser giravên Falklandê. Di vê navberê de min her dixwend û dinivîsand. Çunki min hê ji biçuktî de kiribû heşê xwe ku ezê bibim nivîskar.

Ez demekê li wan deran mam, di vê mayina xwe de ji ali edebî, kulturî, civakî, tarîxi, siyâsi û folklorî ve ez gelekî pêşde çûm û pir jî piiyam, heta ez welê piiyam ku êdi çermê laşê min dihat xwarê. Lê êvarî berî razanê min mast di laşê xwe dida piçekî êşa wê diseinkin.

Carna jî dibû vizîna çend gulle û mermîyên İsrailî û Ereban ku di ber guhêne me re dipêkîyan, lê dîsa jî hewayek edebî û entellektuelî hebû. Mesela, carê tê bîra min, me şorba nîska vedixwar û her weha me munaqeşeyek jî li ser edebîyata pir bilind a Kurdi û

**Y** ekem rojnama Kurdi di 1898'an de li Qahirê derket, 56 sal pişti derketina rojnama Kurdistan ez li hêla Qerejdaxa şewîti ya ku ji sitrana re bûye mesela herî sereke, di nav eşîra Kejan de li gundê Şêxuliya Jêrin a bi dar û ber û şîn û şenahî, di şeveke reş a zivistana tarî de, di pûk û serma û ba û bahoz û berf û baranê de, di odayeke xaniyekî kevn-i kevnare yî nîv xerabe de, bi alîkarîya hin jînepîrên gundê me yê wêran û xopan, hatime vê dunya û gerdûna qehr û hesret û elem û êş kul û derdan.

Bi hatina min a dunyê re jînepîrekê derhalkê mîzgînî gi-handîye bavê min. Bavê min jî li gor 'erf û adet û toreyê Kurdan di oda tijî mêvan de rabûye ser pîyan û dîsa li gor adetên Kurden ku ji wan re kur çedîbe, pêşî destê xwe avetiye debança xwe ya "belçîqa", jarjurek tijî bi hewa de vala kiriye, paşê jî ji bêrika xwe li gor perê wê wextê 50 lire derxistîye daye pîrejinê. Gundî û meriv û nas û dost û heval û hevrê û hogirên bavê min yên ku li wê derê bûne kêfa gişan hatîye. Herkesi yeko yeko, hinekan ji bi hev re bavê min pîroz kirine.

Ez hê di pêçekê de bûm ji alîki de diya min, ji alîki de ji pîrika û carna jî kalikê min û carna jî eger bi mîvanî bihata, xalê min guhêne min ên nuh û nerm û sorik û nazik bi sitran û çîrok û lorîkên me yên folklorîkên kevn ên ku bermaye û mîrasa kultura me ya pênc hezar salî bû, tijî dikirin. Li gor diya mina renckêş û ezîyetkêş û reben û dilovan; ez hê heşt mehî bûm bi ser nîga ketim. Li gel şîre diya xwe û carna jî yê mange û bizinan, ez bi listikêne me yên folklorîk ên zarakan û bi Mewluda me ya Kurmançî

"Hemdê bê hed bo Xudayê alemin  
Ew Xudayê daye me dînê mubîn" mezin bûm.

Emrê min bû şeş, li Tirkîyê îngilaba eskerî çêbû. Di destpêka îngilaba eskerî de ku Cemal Gursel bû serokê Tirkîyê, min jî dest bi mektebê kir. Di mektebê de ez pir zîrek û jêhatî û lêhatî û şek û pek û çapik û zane bûm. Her çendî di wî emri de haya min ji filozofê me yê millî Ehmedê Xanî û şairê me yê sofî yê klasik Melayê Cizîrî û niviskar û şairên navdar û meşhûrên biyani yên wek Şîrazi, Xeyam, Victor Hugo, J. J. Rousseau tunebû, lê dîsa jî meraqa min her li ser edebîyat û hunera bilind bû. Çimkî min her dixwest ez li ciyên bilind rûnim. Ji ber wê yekê ez her tim diçüm ser kevir û gome û zinar û mit û lat û teht û nehitîn bilind û min ew sitrânîn me yên hezar salî yên ku ji kûrahîya taristana tarîxa me hatibûn gehîştibûn vê rojê ku nuha ji alî hin folklorîstên me ve têne berevkirin, digotin.

Pêşî hevalen min, paşê ma moste û pişti wan gundiyyen me û piştre ji bavê min lê varqîlî ku ez geleki zîrek im, ji bo xwendina min, rabû mala me barkir bir Diyarbekira xopan a serberjêr a bi qele û sur û beden a li ber çemê Dîclê, ku di wexta xwe de di bin serokatiya Şêx Se'îdê Piran de Kurdan serî hildabûn.

Min got serihildana Şêx Se'îd divê ku ez behsa kalikê xwe jî bikim. Kalikê min di serihildana Şêx Se'îd de li gund bû. Her çendî ew neketibû şer, lê ez bawer im eger têkete şer, ewê biba qûmandarê Paloyê. Lê li gor gotina apê min ê Seydo, giş ji ruyê pîrika min Etê bûye ku kalikê min neketiye şer. Çunki pîrika min a Etê pir ji kalikê min hez dikir, ji ber wê jî

# BANG

Ev 70 sal in yek li dûv yekê rejimên Iraqê yan şer li ser Kurdan ferz kîrine, yan ji qanûnên ser danine pêsiya wan. Gelek caran ji xwestine bi riya peyman u listikên cuda cuda tevgera azadixwaz a gelê me serkut bikin.

Politika şer u nijadperest ya rejima Iraqê bi tenê di van 31 salen dawî de bûye sedema wêranbûna pitir ji 4500 gundan u 25 bajarên bîcûk, kockirina zedetir ji 2.000.000 hemwelatiyên Kurdistani ji cih li warêne bav u kalan bo kampêñ basûre Iraqê, yan welatên din. Iro bêtir 300.000 Kurdi wek misext li Iranê dijin ku piraniya wan birayen me yén Feyli ne u zedetir ji 200.000 Kurden ji Kurdistana Iraqê li welatên Ewrûpi u çend welatên din penaber (mâhicir) in.

Hemû rejimên Iraqê bi armancı qırkırina gelê Kurdistane u guherandina struktura netewi, ci vaki u cografa Kurdistane, şer u hemû kîryaren faşisti dane ber xwe u bîtaybeti rejima nijadperest u diktatoriyeta Saddam Husén bi hemû awayan hewil daye ku bi politikayen ne mirovan, bîriya zordari, girtin, jenosid u bikaranına çekên kimyayı u biyolojik bigiliye ve armance.

Cendin bûyeren wehsîyane yén ku encamên wan hin ji nehatine derman kîrin hene. Wek Helebçeyê Sehid, Dola Cefayetiye, Sêx Osman, Germiyani, Gelyê Baze u hwd.

Encama siyaseten şer xwaz yén rejimên Iraqê bûne sebebê zedetir ji 200.000 şehîd u windakîrina bêtir ji 183.000 hemwelatiyên Kurd ku pişti erişen çepel yén (enfal) 1988' an u vir de wenda ne.

Le belê yekiti, birati u hevgirtina di navbera hê-

zen siyasi yén Kurdistana Iraqê u rola karger ya Cepheya Kurdistana Iraqê u gyanê xweragirîye u hise bilind ye gelê Kurdistana Iraqê, siyaseta zulum u jenoside ji bini hil-wesand. Di vi warî de raperîna mezin ya 1991'an nimûneyeke dirokî ye, tevi kockirina bi milyonan Kurdan u bûyeren trajedik yén bîhara wê salê, pirsa Kurdi gîhand qonaxkeke nuh. Bê guman Kurden li derveyi welat di vi warî de roleke mezin listine.

Gelê Kurdistana Iraqê di roja 19.05.1992' an de destaneke nuh nivisand; 1.200.000' an di hilbijartina Parlamentoya Kurdistana Iraqê de dengdan. 200 grub u kesen ji Ewrûpa u Amerikayê bi çapemeniya cihane reçavderya hilbijartinan kîrin. Iro parlamentoek u hukumetek ji çend partîyan hilbijartî li Kurdistane heye, sîyaneta hemû cûre azadîyen bîngehin, mafen mirovan u demokrasiye tê girtin. Kurdistan ji imthîana demokrasye derbas dibe.

Ev qonax u ev dem u dezgehîn sava pişti şere 31 salan u çendin bîlâyîn gran, di mercen aloc de ji dayikbûne u niha %90' e abortiya welatê me têk cûye u welat di nav du ablûqeyen abori de ye. Dem u dezgehîn demokratik kontrola 2/3 erde Kurdistane u berpîrsiyariya jiyan u ewlehiya 3.500.000 Kurdan dike ku ji wan 500.000 derbeder in u erden wan di bin kontrola rejima Bexdayê de ne.

Iro:

- 4500 gund u 25 bajarên bîcûk li benda avakirîne.
- Dezgeh u fabrikayen li Kurdistane divê weki ku pêwîst muhtacîyen gel bi cih binin.
- Nezi 2.000.000 hem-

welatiyên me li bende ne ku vegeerin ser ware bav u kalan, ji bona ku jiyanekê normal bîjin u ji kampêñ ku rejîma zordar avakiribûn xîlas bibin.

- 3.500.000 Kurden hemwelati ji ber siyaseta rejîma faşist a Saddam Husén, wêranbûna welatê xwe u ji ber du ebloqayen abori muhtacî her cûre alikariye ne.

- Malbaten 200.000 şehîd u 183.000 Kurden wenda li benda alikariye ne.

- Ev tecruba demokrasiye ji ber buhayiyê ti ambargoyan di tehlike de ye.

Ev tecruba demokratik: Azadiya li welatê me berhemâ xebata netewê me, renca hemû Kurden dilsoz u welatparêz u sembol u hêviya me tevan e. Cespandin u biserxistina we, bare netewi yê me hemûyan e. Ji bo alikariye u piştgirîya demokrasiye. Parlamentoya Kurdistana Iraqê bîryar daye ku li her welateki hessbekî bankayê veke. Ji Parlamentoya Kurdistanê, ji Wezareta Mali u Abori ya Kurdistana Iraqê komiteyek wê serpêrestiya vi kari bike. Ev komite wê di demen destnîşankiri de ji bo kesen ku alikari kîrine, di derheqê miqdar u dema alikariye de agahdariyan bisine.

Em ji hemwelatiyên xwe yén li her çar perçen Kurdistane u bi taybeti ji Kurden li derveyi welat daxwaz dikin ku mil bîdin ber avakirina welatê xwe u li gor imkanen xwe besdariya vi karê piroz bikin.

26.01.1993  
Parlamentoya  
Kurdistana Iraqê

Hûn dikarin alikariyên xwe li ser ve kontoye bişinin:

K. V. D. K.  
Postgiro: 6497899-2  
SVERIGE

## Kurtejiyana min

biyanî dikir. Em welê bi mu-naqşeyê de ketibûn ku haya me ji kevirêñ nav şorbê tunebû ku me ew ji pê re dixwarin. Ji xwe ji ber wê şorba nîska bû ku nuha du diranên min ên qîl şikiyane. Gerçi ji bo çêkirina wan min muracaati Xaça Sor a Swêdê kîriye. Îcar eger bikarîm bidim îspat kîrin ku diranên min ji ber bîr u bawerîyên min ên siyasi hatine şikandin, ewê alikariya min bikin.

Ez dibêjîm qey ez piçekî ji meselê bi dûr dikevîm. Lî na, na...! Qet xwe aciz mekin, ez ê ji vê u pê de pir kurt dibêjîm. Belê, paşê hatim Swêdê. Pişte cûm Parisê, di dû re dîsa vegeryam Swêdê. Nuha li Stockholmê dimînim. Di redaksîyo-

PEN'ê u Yekîtiya Nivîskaran bikim? Ez dibêjîm na! Eyb e! Yan na ez ji dikarim wek hinekan dibêjîm ku ez endamê Amnesty, Federasyon, Komela Spanga, Xaça Sor, Komela Kîrêçîyan, Komela Mamostan, Komela Beledîya taxa me u hin geleken din im.

Belê, ez zanim pir kurt bû, lê ez ci bikim ji xwe navê wê "Kurtejiyan" e. Lî eger xwendevan çend nameyên xweşik u gîlover ên ku pesnê ve nivîse u piçekî ji yê Armancê bide, ji me re bişinin dibe ku hevalen redaksiyonê werin rehmê u fersendek din ji bidin min da ku ez bikarîm ve kurtejiyana xwe piçekî din dirêj bikim.

## Weşanênuh



## Weşanênuh

Amadekar: Rohat


Feryad Fazil Omer, *Kurdish-Deutsches Wörterbuch* (Ferhenga Kurdi-Almani), weşanxana Verlag for Wissenschaft und Bildung, 721 rûpel, Berlin, 1992.

Ev cara pêsin e, ferhengeke Kurdi-Almani li Almanyayê tê weşandin. Di nav rûpelên ve ferhenga mezin de nêzkaya 25 hezar peyvîn Kurdi cih girtine. Di nav rûpelên ve ferhengê de tenê peyvîn ku bi zaravê Kurmanci têngkirin, cih girtine, mirov dikare ferhengê wek ferhengeke Kurmanci-Almani ji bi nav bike.




Petra Wurzel, *Kurdisch in 15 Lektionen* (Di panzdeh dersan deferbûna Kurdi Kurdi), weşanxana Komkar, 232 rûpel, Köln, 1992.

Ev pirtûka bi taybeti ji bo Almanen ku dixwazin Kurdi fîr bîbin, hatiye amadekirin. Ji alyî din kîrî Kurden ku li Almanya yê mezin bûne ji tê. Amadekarê pirtûkê bi xwe Tirknasi u Iranistiki xwendîye, lê belê li ser Kurdi ji kar kîriye u zanyariyên xwe pêş ve bîriye. Di dawîya pirtûkê de du ferhengokên Kurdi-Almani, Almani-Kurdi cih girtine.



Serif Mardin, *Bediuzzaman Said Nursi olayı. Modern Türkiye'de din ve Toplumsal değişim*. (Buyera Bediuzzaman Said Nursi-Li Türkiye Modern Din u Guhastina Civakîj Weşanxana iletişim, 406 rûpel, Stenbol, 1992).

Çapa ve xebata Serif Mardin ya Ingilizi çawa tê zanîn di sala 1989 an de derketibû. Ev pirtûka Tirkî wergera we çapa Ingilizi ye. Serif Mardin, angori zanyariyên dîrokî u civaki li Tirkîye şaxvedana bawerîyên Seîde Nûrsî (1876-1960) wek bûyereke mezin analîz dike. Di dawîya lêkolînê de listeke çavkanyîn li ser ve babetê ji cih girti ye.



# DORMARÊ PİRANÎ Dİ SERNEWË Ú KOSEYÎ

## Malmisanij

Piran û dewanê Piranî di serey serri ra vanî **Sernewe**. Sernewe, 13'ê aşma Janviye (janvier, ocak) di yo. No tarîx, teqwîmê Rûmî gore serey serr o. Herçiqas ki şarê ma teqwîmê Rûmî ra vano "hesabê ma" zî no teqwîm, wextê peyen ê împeretoriya Osmanî de teqwîmo resmî bi.

Tanî cayan di, sernewe ki yeno kebanîya keyî kilori vi razena, qawurme, toraq, pîyaz û çiyê inasarêni dekena miyan, pewjena, keye û kulfet şewa sernewî, piya nê "nan"ê xusûsi wenî.

## KOSEYÎ

Sernewe di herkesî zafêr kosey şâ (keyfweş) benî. Şewa sernewî di gedey (lajekî) û xorî şayî virazeni, yew kay kenî ki nê kay ra dewanê Piranî ra Dêrey di vanî "**koseyî**" yan zî "**koseyey**". Koseyî inawa ya:

Çend hebî gedey yan zî xorî xwi miyan ra yew tenî xemilnenî, cilanê xaman pira danî, peşm û muy ra erîsi (eyî, erdişî) û zimbêlan pa kenî, sere û sirotê yê pêşenî, çimê yê tena akerde manenî. Ge-ge zî teney-meney rî yê sawenî. No "kose" wo.

Kose bê cenî nêbeno. Grûbi ra yewî zî heway vêki (veyeki, veyleki, vêw) xemilnenî, yanî cilanê cenîyan pira danî, mexmeli ser ro danî û riyê yê zî gênî. Hin kenî ki wa ci kes "kosi" û "vêki" nêşinasno. Yewna ten zî yew towre xwi di keno û ina grûbi şona keyan ra geyrena. Ge-ge yewdo ki bişîno lûlî (zel) bice no yan zî 'elbane biceno û çendna hebî embazê bînî zî grûbi reydi benî.

Kose û vêka xwi û embazê xwi şonî berê yew keyî kwenî. Semedo ki sernewe wo, zaf ray wayirê keyî yînî rî berê xwi akenî. Kosey sewlanê xwi nê vejenî û dekwêni zerre, go vendi gênî, kay kenî (ge-ge zî berî ver di kay kenî). Eke lûlibend û 'elbaneçiyê yînî bibî yînî rî lûlî û 'elbane zî ceneni. Kaykerdişê kosan ra pey, ke banîya keyî "şerefî xwi gore" şirane (kesme, bastê), eski can (eskijan), incilan, vaman, gozan yan zî sewbî çiy werî û peran dana sermêne kosan (awo ki towre te de wo) û kosey ay keye ra vejîyêni şonî keyanê bînan di kay kenî. Gey rayîsi ra pey çiy xwi yo ki pêser kerdo pê ra pare (bari) kenî.

Wexto ki kosey şonî yew keye, şarê keyî ge-ge qalan û qîrfan bide (bere) kenî yan zî personî, wazanî ki bizanî hela veyni vêka yînî kam a, mîrdey ya (kose) kam o. Labelê grûbi nêwazena ki yê vêki û kosi bişinasnî, semedê aya ra zî

yînî rî nêvana. Ray esta ki xort yan zî camerdê keyî wazanî zorkanî (ebi zor) serey vêki akerî û "ya" bişinasnî yan zî biremnî. Labelê çiwa kosî dest di ya, o dano yînî ro û nêverdano ci kes heta vêki ra şero, destê xwi pa no. Mesela mesela "namusî" ya(!) Eke kose koseyê do sistek nébo, şar nêşino destê xwi vêka yê ra no, riy yay ako û veyno yan zî yay yê ra bigiro. Pawitîşê vêki verê verkan wezifey kalî yo. Ge-ge vêki bi xwi di zî yew derzini yan zî gocîni bena, kamo ki şero destê xwi ya ra no yan zî biwazo riy yay akero, a derzin yan zî gocîna xwi yînî ra kena.

Kosey gilangan dewa xwi ra şonî dewanê bînan di zî keyan

Piranî û tanî dewanê yê di vanî "**domdom**" (domdom gey-rayış), tanî dewanê Piranî û Gêli di -mesela Himbelî û Qizilan di- vanî "**dam dam**". Tanîna cayan di ti ra vanî "**kalo**".

Hetê Çewligi di Kirdî (Zazay) "koseyî" ra vanî "**gaxonî**" (gaxoni arê dayış) (3). Kurdê Dêrsimiji vanî "**gaxan**" (Kalê Gaxan)/"**gaxand**" (Kalikê Gaxêndê). Dêrsim di wextê "**gaxanî**" di hîrê roji roje zî gênî (4). Tanî nuştoxan gore, şayıya "Kalikê Gaxêndê" 26'ê aşma "Çileya pêşîn" (décembre, aralık) di ya (5). Labelê M. Nûrî Dersimî vano (6) Dêrsimiji "**Teqwîmê Şerqî** gore rojanê verînanê aşma Desembre (dê-

nuştoxi vanî ki Dêrsim di "gaxand" hîrê rojanê peyenan ê aşma desembre (décembre, aralık) wo (8).

Kelîma "**gaxon**"/"**gaxand**", kelîma "**gaxant**" ya Arminîkî manena. Me'nâ "**gaxantî**", ziwanê Armeniyân di "serê serri", "sernewe", "serra newa" ya.

Zeki mi cor ra neql kerd, Nûrî Dersimî vano ki Dêrsimiji "semêdê Zerduşti" ra nê roşanî kenî". Erjeno ki merdim na iddia ser o vindero. Çimkî dinê Zerduşti di şes hebî roşanê serri esti ki yînî ra vanî "**Gahenbar**" yan zî "Gehenbar". Ziwanê Pehlewî di nê roşanana vanî "**Gasanbar**". Tirê eleqey "Gaxan" û "**Gahenbar**" ê Zerduştiyan esto? Ziwanê Pehlewî di roşanê şeşin ê Zerduştiyan ra "**Hemespe meidéyeh**" o. Bawerîya Zerduştiyan gore, roşan yan zî şayıya "**Hemespes meidéyehî** rojê 360'i-nê serri ra heta 365'i-nê serri de wam kerdinî û yînî nê panc rojê peyennê serri bi şayı û keyfi viyarnayî. Bawerîya yînî gore, Ahûremzday nê rojan di mîrdimo veren xelegnabi.

Rojê "**Hemespesmeidéyehî**", teqwîmê mîladî gore raştê rojanî 16-20'ê aşma Adari (mart) yenî. Zeki mi va, "**Hemespes meidéh**" "**Gahenbar**" anê Zerduştiyan ra ê şeşin o. Nameyê "**Gahenbar**" ê pancin ê Zerduştiyan "Mîdyarîm" o û me'nâ yê "ortey serri" wo, 75 rojî "**Gahenbar**" ê şeşini ra ver o, roşanê xelegiyayışe **heywanan** o û teqwîmê mîladî gore raştê rojê verenê aşma Janviye (janvier, ocak) yeno (9).

## TANÎ CAYANÊ BÎNAN Dİ SERNEWË Ú KOSEYÎ

"Koseyî" sewbî tanî cayanê Kurdistanî û Turkiye di zî esta labelê ca ra ca namey û tarixê yay bediliyêno. Mesela dewanê Dîvrîgi (10) di, ortey zimi-

stanî di 15'ê aşma Janviye di yew roşan esto ki "koseyî" yan zî "gaxanî" maneno (11). Dêwanê Artvinî (12) û Posthoffî di 31'ê aşma Desembre (aralık) di şew -yanî şewa sernewî di "koseyî" kenî. (13).

Dor-marê Qars (Qers) û Qerekilisi (14) di zî "gama ki zimistan qedêno, verniya vesarı di" yew roşan beno, namey ney "**Kosegeli**" yo. "Kosegeli" di zî "**kose**", "**bük**", "**kal**" û "**Ereb**" esto (15).

Dor-marê Wêranşarî di "kosi" ra vanî "kose". Dor-marê Wani (Van) di zî mesela 'esîra Burukî miyan di ekserîya verniya aşma Sebatî yan zî ortey na aşmi di "koseyî" bena. Burukî zî "kosi" ra vanî "kose" labelê cenîya kosî ra vanî "Nari". Tanî nuştoxan gore, Burukî semedê bereket û vêşîbi-yayışe mîşnan (meyan) na şayı kenî (16).

Nê hemîni ra fahm beno ki sernewe û koseyî 'edetê verîn i üû ca ra ca namey û rojê yînî vuriyêni (bediliyêni).

(1)Kurmancî (Kirdasi) di "dam û dam" zî vanî (Bewni Celîle Celîl, Zargotina Kurdêne Sûriyê, Yê ku ji tipen Kirili wergerdiye tipen Latînî: Ahmet Ömer, Weşanîn Jîna Nû, Stockholm, 1989, r. 348)

(2)Musa Anter, Naturâlîm, Doz Yayınları, 1990, r. 22

(3)Malmisanij, Ferhengê Dîmilki-Tirkî, r. 123

(4)Munzur Çem, "Alevilik Sorunu Üzerine", Deng, İstanbul, no: 18 (Şubat 1992), r. 5

(5)Wuso, "Kalikê Gaxêndê", Denge KOMKAR, Frankfurt, no: 60-91 (7. 1. 1984), r. 11

(6)Dr. Vet. M. Nuri Dersimî, Kürtistan Tarlhinde Dersim, Halep, 1952, r. 31

(7)M. Duzgin, "Adet û Toreyê Dersimî", Berhem, no: 4, r. 18

(8)Dr. A. Medyah, Antik Kürtistan'da Dinsel Yapılanma ve Zerdeş Öğretisi, 1991, r. 34

(9)Celîl Dûstxâh, Avesta Kohentîrin Sorûnda vo Metnîhayê İranî, Enteşatî Morvarid, c. II, 1370, Tahran, r. 1049, 1061, 1084

-Dr. Cehangir Üşîdrî, Danişnameyê Mezdyesna, Şirketî Neşîre Merkez, Tahran, 1371, r. 403-404

(10)Dîvrîgi (Divriği), qezayê Sêwasî yo.

(11)Prof. Pertev Naili Boratav, 100 Soruda Türk Folkloru, Gerçek Yayınları, İstanbul, 1973, r. 276

(12)Artvin (Artvin), yew wilayetê Turkiye wo.

(13)Prof. Pertev Naili Boratav, 100 Soruda Türk Folkloru, r. 276

(14)Qerekilise (Qerekose, Ağrı) yew wilayetê Kurdistanî yo.

(15)Vazgal, "Kosegeli Yan jî Kalikê Serê Salê", Roja Nû, no: 28 (1990), r. 11-13

(16)Ahmet Özer, Doğu Anadolu'da Aşiret Düzeni, Boyut Yayınevi, İstanbul, 1990, r. 91-92

Adnan Gerger zî na mesela ser o nuseno, labelê herçiqas ki yê behs nê kerdo zî wina fam beno ki yê kitabê corîn ê Ahmetê Özerî ra "istifade kerdo." (Bewni Adnan Gerger, Kürlerde Toplum Geçerînin Yaşamsal Temeli Dağların Ardi Kimin Yurdur, Ankara, 1991, r. 85)



ra geyreni û çî arê danî.

Ge-ge zî kosey şonî banê yew keyî ser û locini (lujini) ra towrey xwi verra danî acér, vanî "dam dam..." ("dom dom...") (1) û çî wazanî, wayirê keyî çiyê werdi (werî) dekenî towrey yînî, yê zî towrey xwi kaş kenî (ancenî) û peynî di çiyo ki pêser kerdo yewbînan ra pare kenî.

## "GAXAN" Û GAHENBARÊ ZERDUŞTÎYAN

MIyanê Piranî di û tanî dewanê Piranî di -mesela Bazbendi di- "kosi" (mîrdey vêki) ra vanî "kal"/"kalo", Pirejman (Pirajman) di vanî "kalpoše", hetê Çewligi (Bingol) di vanî "kalo". Tanî Kurmancî (Kir dasi), kosi ra vanî "qirdik" (2). "Koseyî" ra zî miyanê

cembre, aralık) di hîrê roji roje gênê, dim a şayıyan û şenayîyanê girdan (pîlan) kenî û çekan (tifing û şeşdarb-Malmisanij) erzenî. No roşan, pîle pîlan û muqeddesê muqeddesan ê roşanaren hesebiyêno, çimkî semedê Zerdeştiyan ra kenî." (M. Duzgînî zî nê cumleyê M. Nûrî Dersimî taday (tercume kerdi) labelê vatey "Aralık ayının iptidasında" şaat tadowo, vato "rozonê peyêne Çili (Aralixe) de" (7). Çimkî me'nâ "iptida", "peyên" niya, "verîn" (veren) a.

Eke "teqwîmê Şerqî" ra questê M. Nûrî Dersimî "teqwîmê Rûmî" bo, verniya aşma desembra Rûmî, teqwîmê mîladî gore 13'ê na aşmi beno û no tarîx tarîxê serneweyê Piranî ra yew aşmi aver o. Labelê zewbî tanî

## Seddam li dû provakasyonê...

Li ser van bûyeran dewletên hevpeyman, Iraq tehdid kîrin ku li gor peymana NY herket bike. Lî Seddam li hember tehdîtên wan, wî jî ew tehdid kîrin. DYA 48 saet ultimatom da Iraqê. Pişti wexta ultimatom bi sê rojan balafîren Amerika yên ku ji keştiya "Kitty Hawk" radibûn û yên Fransizî û Ingîlizan li Iraqê xistin (13.01. 1993). Vê êrîş bi balafîr û roketan çend rojan dom kir. Iraqê disa wek gelek carê berê hemû şertên NY qebûl kîrin.

### Hesabê Seddam ci bû?

Ji destpêkê heta dawiya vê buhranê, Seddam bi beyan û şela xwe dilwazâşer bû. Digel diyar bû ku Iraq ji aliye eskeri ve mahkûmê têkçûyin û carek din testîmbüyin bû. Gelo cîma Seddam xwe avêt macerayeke weha?


Wi bi vê siyaseta xwe xwest;

1- Ji dema guherandina iktidara Amerikayê feyde bigre; bi çend fortan, itibara xwe ya li hundurê welêt piçekî bigurine.

2- Clinton biceribîne. Wi dihesiband ku bi hindakayî di rojîn pêşî yên serokatiya xwe de Clinton wê şîdetê bi kar neyene.

## Xacepîys

### Amadekar: S. Rêving



**ÇEPERAST:** 1-a) Di sala 1946'an de bû paytexîte yekem cumhuriyeta Kurdistanê. b) Ji navê kur'an 2-a) Eşkere, vekirî b) Li Efrîqayê wela-tek 3-a) Pronaveki şexsi b) Meles, temezî, şarpe c) Peyva ji bo gazikirina kesen nêr 4-a) Poz, bêvil (berevajî) 5-a) Dildar, hezjekirî b) İtifaq, li ser tiştekî li hev kîrin (berevajî) 6-a) Sala ku em tê de ne. b) Kurê dê û bavê yekî c) Vexwarineke se-rekî (berevajî) 7-a) Berfi-reh, biber (berevajî). b) Ava zer ya di birin, yan kulan de. c) Ne nêr 8-a) Fekiyê darberûyê. c) Ji navê kur'an (berevajî) 9-

Pêşnavê kesê Swêdi ku dinamît ıcad kiribû û her sal li ser navê wî di warê ekonomî, edebiyat, aşti, fizik, kîmyayê de xelat tê belavkirin. b) Kesê ji yekî re ne biyanî c) Kûcik. 10-a) Vegetandek binavkirî b) Ji ne-xweşîya "sîma", "ta'yê re jî dibêjin (berevajî) 11-a) Gêrik (berevajî) b) Di alfabe ya latîni ya Kurdî de herfa yekem û ya şeşem c) Jan, 'kul', 'derd'. 12-a) Rengek (berevajî) b) Ale-tekî muzikê c) Kesê ji qewmê Arî.

**SEREJÊR:** 1-a) Navê berhemê binavûdeng yê helbestvanê mezin Eh-

3- Ev hesabê wan hemû cî negrin û DYA êrîş bike jî, wê bi balafîr û fuzyan êrîş bike, dûre raweste. Çawa be leşkerên wan ên reşayiyê wek cara din bi deh hezaran li herêmê nînin. Dema êrîşike weha kir jî, wê demê dewletên musilman û Ereb wê nerazibûna xwe bidin diyarkirin. Cîma mesela Bosna-kan û Filistinîyen ji İsrail hatine derxistin li rastê ye, DYA mudaxeleyek raste-rast nake, lê êrîşî Iraqê dike. Ev du standartî wê tesirê li Tirkîye jî bike. Ev nerazibûn pêşde dikarin bibin zeminê politikayekê hîn cihêtir.

4- Bi vê riyê xwest awireki bide Kurd û Şiiyan. Bêhu-zuriya herêmê zêdetir bike.

Bi taybetî hesabê Seddam ê sisiya girt. Yek-du ne tê de ci bigre hemû dewletên Ereb li hember êrîşâ dewletên hevpeyman derketin. Li Tirkîye muxalefata li hember Iraqê zeşî bû.

### Kurd bi tedbir in

Li hember van bûyeran Kurd bi tedbir bûn. Hêzên xwe yên li ser hudûdê navbera xwe û leşkerên Seddam, taqwiye kîrin.

Li gor agahdariyê hukumeta Kurdistanê, Seddam 3 tumenê xwe yên top û piyade

Roya 23'yê mehê jî li Suleymaniye bombeyek teqîya, 18 kes birîndar bûn.

Li gor Cigîrê Wezirê Hundur Ahmet Şerif di van du salen dawîyê de li dor 100 ajanen Iraqê li Kurdistanê di dema haziriyê sabotajen de bûne, hatine girtin.

Irak hîn ji sabotajen li hember wasitâyên ku alîkarya NY dîgîhîjînîn Kurdistanê, didomîne. Di van çend rojîn dawîyê de 2 erekben din ji hatin bombekirin.

### Mîrza Bextiyar

medê Xanî. b) 'Mêrê bizinê 2-a) Zelam (berevajî)

b- Li Kurdistanâ bakur navê bajareki ku "Mala Eliyê Yûnis' di salen 1920' an de li wir li dijî hukûmete Tirkân serî hilabû. 3-a) Gotineke teyîd kîrinê b- Pozbilind, qure (berevajî) c- Rih (berevajî) 4-a) Ne, nexêr (berevajî) b) Kesê pîr. c- Bi Soranî 'bi'. d- rih 5-a) Pêşû. 6-a) 'Qûtiya' girtî ku mirov pere û kaxezén pir bi buha tê de vedişere (berevajî) b- eser, berhem 7-a) Navê cihek ji laşê mirovan b- Mîsal, mînak 8-a) Ji na-vê kur'an b- Lîstikeke Kurdî ku bi 32 berikan tê listin. (berevajî) 9-a) Kinc, 'sileh' b- Kesê ku zanînê dide hinekîn din. 10 a) geh (berevajî) b- Baneşanek c- ji xwarina dewar-an. 11-a) Tamek, çejek. b- Pronaveki işaretê c- Bi Soranî 'stêr'. 12-a) Se-rokvezîrê Swêdê ku di sala 1986' an de li Stokholmê hat kuştin b- Mêr.

### Bersîva hejmara berê

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12

## Li Kurdistanê terora li ser dermanxanan

Eczaciyan jî nesibê xwe ji terora li Kurdistanê girtin. Ji ber terorê eczacîyên ku firsendê dibînin, ji Kurdistanê direvin, bar dikin Tirkîye. Ev barkirin pirani jî li Kars, Agırî, Wan û Müşetî dîtin. Li-ser pîrsen muxabîrîn rojnama Cumhuriyetê Kenan Biliz, serokê Yekîtiya Eczaciyan ya herêma 13'an Haluk Ziya Ger weha dibejê: "Ji ber terorê eczacîyên me di bin xeteriyê de û blî dijwari karêñ xwe di-

kin. Bi taybetî nobetdariya şevê pir bi talûke ye. Wê ki were û wê ci bibe meçhûl e. Mirovîn normal jî têñ, yên militan jî têñ."

Li qezayêñ Qersé, Akyaya û Suzû, li qezayêñ Agırî, Hamur, Ikdir, Melekîl û Karakoyunu, li qeza Erzin-canê, Uzumlu û qezayêñ Erzunumê Pazaryolu, Koprukoy û Yaxanê eczaxane tunene.

## Osman Aytar

Medya Guneşî di Nisana 1988'an de dest bi weşana xwe kir. Berê, mehê carekê û ji Ilona 92'an û vir de jî 15 rojîn carekê derdikeve. Lî li dijî êrîşen dewletê ançax heta nuha 22 hejmarên wê derketin. Ji 22 hejmaran 18 hejmaran wê ji aliye dewletê ve hatin topkirin û di heqê wan de dawe hatin vekirin.

Bi topkirina kovarê, armanca dewletê ew e ku kovar ji aliye aborî ve têk biçe û dernekeve.

Helbet êrîşen dewletê ne tenê li dijî Medya Guneşîne, herwisa dewleta Tirkîye kovar û rojnamen din yên Kurdan û çepen Tirkan in jî

zayê pere xwarin.

Li dijî êrîşen dewletê 26 rojname û kovarê sosyalist, şoresser û pêşverû yên Tirk û Kurd çendekî berê beyanek derxistin. Di beyanê de tê gotin ku, "rojname ji aliye dewletê ve têñ sansurkirin, buroyen rojnaman û kovaran di bin êrîşen dewletê de ne, rojnameyan têñ kuştin û hepiskirin."

Ev fakt ji nîşan didin ku li Tirkîye azadiya fikri ançax bi vî hawî heye; kovar û rojname derxistin serbest e, lê ji yên derdixin, dixwîn û difroşin re jî tehdît, lêxistin, kuştin û ceza heye.

## Kurdistan ji nuh ve...

Hîzân, Wan, Müş, Adiyaman û gundê Meletiyayê bûn qada işxala hêzên ordiyê. Bes li gundê Adiyaman û Bedîsê bi sedan kes hatin girtin. Ji çar gundê Handûxê ku girêdayî Herzexê ye, tu deng tuneye. Ev; Abdullâh Ay, Mehmet Çalîş, Şukru Yakar û kesekî din e.

Hêzên dewletê di operasyonan de gundê Şemdinliyê; Garra, Masîno, Şawîrta şewitandin. Li Wanê organê cinsî yên Findî Alkol jê kîrin.

Di operasyonan de bi wesîla kampê PKK'ê, ji

bo çavtîrsandinê, gund, gir û çiyan dide ber bombeyan. Herêma navbera Pasûr û Bingolê, gundê Bolukyazi, Oleka Jérîn, Oleka Jorîn û Şêxdûman, gundê Tatwanê Aladere bi balafîr û helikopterên Kobra û Skorsky hatin bombe kîrin. Van demen dawî jî bomben "bê xwedî" diteqin. Bimbayek bi vî rengî Li Tatwanê, li taxa Sosyalê û yet jî li gundekî Şîrnexê teqîya.

Cinayetên "quesas nedîyar" roj bi roj zêdetir dibin. Bes di vê meha dawîn de li Batmanê 40 kes hatin kuştin. Li Silîva, li Nusêbin û

## Sibê dikane dereng be!

Hemû edebiyata nivîskî; yanî kovar, rojname, kitêb, belavok, program û hwd. divê giş bi Kurdî bin, bi Tirkî tunebin. Çimkî gava bi Tirkî hebin, kes bi Kurdî naxwîne. Yanî divê bi hawakî em millet mecbûrî fêrbûna Kurdî bikin. Heta nuha me û hêzên Tirk, hemû weşanen xwe bi Tirkî derxistin, me tu carî negot wele bi milyonan insan hene ku bi Tirkî nizanîn, divê em li wan jî bifikirin. Ka demekê jî em bes bi Kurdî derxin. İcar jî yên bi Kurdî nizanîn bira hinekî fêr bibin; ma wê kevir bare! Dema pirr hewce be meriv dikane hin tiştan wergerine Tirkî, ne ku ji Tirkî wergerine Kurdî.

de gelek trajedyen şexsî hene ku ne hewcye meriv qala wan bike.

Ew rojname û kovarê ku tenê bi Tirkî ya jî bi Kurdî û Tirkî derdikevin divê ji wan re qet neyê nivîsin. Bê guman quesda min yên ku Kurd derdixin.

Axir bi kurtayî, Kurd jî wek çêlên beytikê heta ku bi firê dikevin, divê demekê bi Kurdî biçeyîvin, bi Kurdî bifikirin, bi Kurdî bixwînin û bi Kurdî bînîvisin. Heger em naxwazin wek millet bihebin û bîbin Tirk, divê li hember asîmîlasiyonê em bi hev re seri hildin. Bi baweriya min iro şoresserî û welatperweriya herî mezin ev e.

## Li dinê

### Li Yugoslavyaya kevin hîn jî xwîn diherike

Ji sala 1991'an û vir de ye li Yugoslavyaya kevin şerê di navbera gelan de bi hemû gurriya xwe dom dike. Pêşî şer di navbera Sîrb û Slovaniyan de derket. Dûre şerekî giran di navbera Sîrbistan û Xirvaştanê de. Pişî wê jî qada şer bû Bosna û Herzex. Dema ku hemû aliyê Bosna Herzexê di guftûgoyen Cenevreyê de ku ji aliyê Davîd Owen û Cyrus Vance ve dihat meşandin li hev dikirin, hêzên Xirvatî êris birin ser herêma Krajina ku piranî Sîrb lê dijin. Nuha xetera ku şer hîn gurttir bibe, heye.

Di şerê Yugoslavyayê de bi deh hezaran însan mirin, bajar û Gund xera bûn.

Heger pêsiya şerê Yugoslavyayê neyê girtin, talûka ku şer li hudûden Yugoslavyaya kevin derbas be, mezin dibe.

### Vaclav Havel bû serokê Cumhuriyeta Çekistanê

Vaclav Havel Serokcumhûrê dawîn yê Çekoslovakayê bû serokcumhûrê pêşin yê Cumhuriyeta Çekistanê. Pişî dewleta Çekoslovakî ji holê rabû, Çekistan û Slovakî bûn du dewletên cihê, Cumhuriyeta Çekistanê roja 25'ê Çileya Paşin ji bo serokcumhûrê hilbijartîn çêbû. Vaclav Havel bi 109 dengen hat hilbijartîn. Namzetê komünîstan, Marie Dlîborova 49 yê pro-nasyonalîstan jî 14 deng girtin.

Encama herî balkêş ew e ku bêyî şer, bi bîryara parlamento ya Çek û Slovakia, du dewletên bi şerê xwe çêbûn, bêyî ku xwîn birije.

### Honecker serbest e

Serokê DDR'ê û Sekreterê Gişî yê Partiya Yekitiya Sosyalist a Almanya kevin Enrich Honecker di celsa dawîn ya mahkemê de ji ber nexweşîna xwe ya kanserê tâhiye bû û mahkema Eyaleta Berlînê dawe ji bin de iftal kir.

Honcker cû Şiliyê ba jin û qîza xwe. Qîza Honecker bi yekî Şili re zewicî ye.

### Clinton dest bi kar kir

Serekê 42'em yê Dewletên Yekbûyi yê Amerika Bill Clinton roja 20'ê Çileya Paşin bi merasimekê sondxwar û dest bi kar kir. Her di eyî rojê de George Bush jî xatir ji Qesra Sipi xwest.

Di merasimê de Clinton axaftînek kurt kir. Di ciyekî axaftina xwe de Clinton weha got: "Dema ku menfeetên me yên heyatî bênen tehdîtkirin, an ji dema li hember irade û wicdanê koma netewî bê derketin, heta mumkun be bi riyên diplomatik yê astî û dema pêwist be ji eme bi hêz li hember derkevin"



### İsraîl û PLO li hev tê?

Di meha Çileya Paşin de ji pirsa 405 Filistîniyênu ku ji Israîl hatine derxistin hel nebû. Digel bîryara NY û hewildanêni diplomatik Israîl ji ya xwe danekeve û ew 400 Filistîniyênu ku ji welat avêtinê derive, ji para nastîne.

Israîl ji aliyekî ve vê hişkiyaya xwe didomîne, ji aliyê din ve ji bi rakirina qanûnêkî riya danûstendinê bi PLO re vekir. Di vê meha buhûrî de meclisa

Israîl, qanûna ku dan û stendina bi PLO re yasax dike, ra kir. Ev bîryar li hember 20'î bi 39 rayan hat qebûlkirin.

Pişî rakirina vê qanûnê keça Moše Dayan, Yael Dayan ku parlementer e, cû Tunusê bi Yaser Arafat re rûnişt. Gelo bavê Yaelê sax bûye wê çi bigota!? An ji Yaser Arafat çend sal berê civînek wiha di xwna xwe de ji bidîta, wê bawer bikira!?

### Ber bi dinyayek bê nukleer ve

Roja 3'yê Çileya Paşin li Moskovayê, li Qesra Kremlînê Peymana Start-2 ku ya di warê kêmkirina çekên nukleer de lihevhatina herî fireh û mezin e di navbera George Bush û Boris Yeltsin de hat imzekirin.

Li gor vê peymane jî stokênu nukleerî yê her du welatan ji sisîyan dudu wê bênen kêmkirin. Pişî imzekirina peymane, di civîna çapememîne de Bush ji bo vê lihevhatinê got "ji dunyayekke bi hêvi re deriyekî nuh vekir".

Serokdewletê Rusyayê Boris Yeltsin jî got "peymana hêviya sedsalin rê li qonaxeke nuh vekir".

# BEROS

Mahmûd Lewendi

### Ecêbek giran

Cî dunya ye! Em bi şev û rojan dixebeitin, naxwin ve naxwin ji xwe re kitab û kovar û rojnameyan dikirin, cild bi cild ansiklopedîyan dikirin. Cî bi peran be, ci bi wasita hin heval û dostan be em xwe digihînin welat û dewletan hin çavkanîyen ku li ser Kurdan e bi dest dixin. Dîsa bi şev û rojan em rûdînin wan dixwînin, bi sedan not û nivîsan jê derdixînin, paşê em wan not û nivîsan û yên di hesê xwe de ji tevê dîkin da ku em bikaribin piçek be ji xizmetekê bigîhînin edeb û tarîx û zimanê milletê xwe em meqaleyekê dînîvisin. Lî hin Kurdên me jî rabûne wek teralê Bexdayê, bê ku xwe biwesînin, wan meqaleyen me bê fedî û şerm li ser navê xwe di hin kovar û rojnameyan de belav kirine. A ha ji we re çend mîsal:

1-Mikail İbrahim, "Elvis Presley Derket Kurd", rojnama Bizav, Bexdad, jimare: 22 (26/12/1989), r: 2

Vî dîzê hêja, ev nivîsa min ji Mirkut, no:2/1985, r:10 girtîye, bêyî ku tiştekî biguherine li ser navê xwe çap kirîye. Lî malxirabo qet ne-gotîye min ji filan cihî diziye!"

2-"Şark ve Kurdistan (Rojhelat û Kurdistân), İstenbol 1908", rojnama Bizav, Bexdad, jimare: 10 (3/10/1989), r: 8

Vî malxirabi jî ne navê xwe û ne jî yê me nivîsiye. Ev meqale jî ji kitêba min û Malmisanij "Rojnamegerîya Kurdi", r:24" girtîye.

3-İsmail Tenya, "Govara Yekbûn, İstenbol 1913", rojnama Hawkari, Bexdad, no: 1168, (1990), r: 8

Soran ji "tenê" ya Kurmancî re dibêjin "tenya", içar ey İsmail Tenya'yê diz, çawa be ez nikarim tişteki bi te bikim, lê ma ez nikarim nifirekê ji bikim? Hema tu her "tenya" bîmîni. Vî dîzmîri jî ji kitêba min û Malmisanij; "Rojnamegerîya Kurdi", r:58" ev qisim girtîye û li ser navê xwe belav kirîye.

4-Newzad Elî Ehmed, "Kurd Teavvun ve Terreqî Xezetesî (Rojnama Alikarî û Pêşketîna Kurd)", Estembûl 1908", Bizav, Bexdad, jimare: 9 (1989), r: 5

Vî nivîsdizkarê nehêja jî wekî hevdîzen xwe, ne nav û ne çavkanîyek nivîsandiye. Hema raste rast meqala min û Malmisanij ku di rojnama Armancê (no:77/1988, r:5) de derketibû, ji xwe re wekî malê bavê xwe çap kirîye.

**Pêkenînek  
ji Kemalê me yê Parisê**  
Mêrik ji kurik pîrsî:  
-Xwarzê navê te bi xér?  
-Mûtuûruûubûsa!  
-Navê min ji Mûsa ye, le ne bi vê ecêbê!

### ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgin

■ Li gor jeologan, Swêd û Norweç 3-4 hezar salan de ji behrê 200 m. bilind bûne.

■ Bi teknolojiyeke nû ya lasarê qesartina kartol (patat) wê hêsan be. Li gor lêkolina William McComis û hevalen wî li Battelle Memorial Institute li DYU tîrêjîn laserê di 1000 derecê de qalika kartolê dişewitine û tu zîrar nade kartolê.

■ Çavê însan wisa hatiye çekirin ku dema mirov ber bi jêr dinêre zaftir tiş qeyd dike.

### Helbestek

(Ev helbesta bê "sernav" di navçar deqiqeyan de, yekser li ser kompitürê ji bo vî quncîki hatîye nîvisin, cunki ci vala bû, dîvê ku tiji bîba. Ya duduyan ev helbesta jîrin mumkun e ji hin şairên me re bîbe misalek bas da ku bikaribin li ber ronahiya vê helbeste piçekî be ji bibînî ku lawê bayan çawa helbestan dînîvisin)

Ax ax ax!  
Bi ax û waxê  
Em bûn xax  
Pîre rabû ser piya  
Gazi kire gundiya  
Ax welet ax!  
Serê çiya bi dûman e  
Qey disa ezingvaniya ağır dadane.  
Hindik hindik dîbe gundiuk.  
Eman eman gundino  
Heyla gidi malino  
Jin hene jinkok hene.  
Ax welet ax!  
Axina min ji nava min te  
Zikê min diêşe  
Ax welet ax  
Ava te ya sar û zelal  
Di germa havinê de dikele  
Dikele, pir dikele  
Heta ku difire  
Ü paşê namine.  
Li gel seriyek pivaz û perçeyek nan  
Dilê min diçe şorba nîsk û dan  
Dilo ez bîrim dilo qurban  
Li vê havinê  
Ez mam bê av  
Li ser min tav  
Ji hêştirê dikevîm  
Ji hop hopê nakekîm  
Hopanê hopanê  
Keziya min a panê  
Golikek xera dike navê garanê  
Ü weletê me kanê  
Heyla lê hayê, heyla lê hayê  
Te têxim kadîna kayê  
Pencerê bigre bila neyê  
Dengê guve-guva bayê  
Erê Gulê min nego  
Bi gulekê buhar neyê  
Dilê min liyane, dilê min liyane  
Ewrén reş hatin dîsa baran e.  
Kef û eşqa min rabû  
Disa wexta helbestan e.  
Masiyên gola avetiñ çola  
Hesin qewî ye, lê ne wek pola!

■ Çar lêkolinerên Fransızî ji bo ke-sen kerr metodeke nû dîtine. Li gor vê metodê cihazê bihistinê ne li piş guhê mirovî lê li diranê mirovî tê monte kirin. Ev cihazê dengan digre û bi şiklê pêla radyoyê dişine guhê mirovî û ji vir ji digihîje mîjî û bi vî awayî deng tê bihistinê. Avantaja vî cihazî ew e ku di nav devê mirovî de veşartiye û nayê ditin.

■ Amerika Bakur di salekê de 8 cm. ji Ewrûpayê dûr dikeve.

■ Roj ji wek dinya li dora xwe digere. Rotasyona dinê li ku dîbe bila bîbe 24 saet e. Lî rotasyona rojê li gor paralelan tê guhertin. Gava roj li dora ekvatorê biç, rotasyona rojê 27.5 roj digre. Sebeba vê yekê ji avabûna rojê ye. Roj ji gazêni bi şewat pêk tê û rotasyona kutleyek gazê ji kutleyek wek dinê cûdatir e.